

**PERWERDEYA
NETEWEYA DEMOKRATÎK**

Têbînî:

Di amadekirina naveroka vê pirtûkê de ji parêznameyên Rêber Apo. Ji lêkolîn û nirxandinên saziyên perwerdeya civaka demokratîk ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê sêd hatiye girtin.

AKADEMIYA CIVAKA DEMOKRATÎK A
ŞEHÎD ABID XELÎL Î ASYA YÛKSEL

Naverok

PERWERDE Û HÎNKARIYA NETEWEYA DEMOKRATÎK	7
RÊBAZÊN PERWERDEYÊ.....	12
ŞÊWAZÊN PERWERDEYÊ.....	26
PERWERDEYA NETEWEYA DEMOKRATÎK	45
NÊRÎNÊN LI SER PERWERDEYÊ.....	53
RÊXISTINKIRINA PERWERDEYÊ	56
NÊRÎNÊN LI SER PERWERDEYA PÊŞDIBISTANÊ	64
DI PÊVAJOYA PERWERDEYÊ DE RÊGEZÊN PERWERDEYA PÊŞDIBISTANÊ.....	65
WARÊ PÊŞVEÇÛYÎNÊ YÊN ZAROKAN.....	76
PÊVAJOYA PERWERDEYA PÊŞDIBISTANÊ.....	81
BEŞDARIYA MALBATÊ	89

PERWERDE Û HÎNKARIYA NETEWEYA DEMOKRATÎK

“Civak tecrûbe û ezmûnên xwe yên teorîk û pratîk weke agahî dide endamên xwe nexasim jî dide ciwanan, mirov vê hewldana civakê ya dixwaze tecrûbeyên xwe bide qebûlkirin weke perwerde bi nav bike. Dîsa bi çalakiya perwerdeyê zarokan dikin civakî. Perwerdekirina zarokan wezîfeya desthilatdarî û dewletê nîne, wezîfeya herî girîng a civakê ye. Ji ber ku zarok û ciwan ê wê ne. Hem heqek e, hem jî wezîfeyek e ku civak zarok û ciwanên xwe li gorî rêûresmên xwe, xisletên xwezaya xwe ya civakî bigihîne, veguherîne xwe û ev jî mijareke man nemanê ye; ji ber ku ji bo civak hebûna xwe dewam bike ev pîrsgirêk e. Ti civak mafê xwe yê hebûnê û ji bo vê jî wezîfeya perwerdekirina ciwanên xwe bi ti hêzê re parve nake, dewrî ti hêzê nake. Hêzên behsa wan têne kirin, her çi qasî dewlet an jî amûrên desthilatdariyê yên curbicur bin jî, ev heq û wezîfe nayê dewrkirin. Naxwe wê xwe radestî serweriyên yekdestdariyan kiribe were hesibandin. Pîrozbûna mafê perwerdeyê ji ber rola wê ya di hebûnê de ye, ango man û nemanê ye. Di serî de dê û bav ti hêz bi qasî civakê nikare zarok û ciwanên xwe be, ne jî dikare pêdiviyê bi nêzîkbûna wan bibîne. Di tevahiya dîrokê de yek ji çalakiya dijber a şaristaniyê ew e, civakê

ji zarok û ciwanan mehrûm dihêle. Van çalakiyên xwe bi du rêyan pêk tîne: Yan yê mezîna îmhî dike û zarokên wan dike kole, yan jî bi armanca qaşo perwerdekirinê wan ji bo bi kar bînin digirin qatê desthilatdariyê. Yek ji armancên herî girîng ên şerî ew e, weke malê herî bi qîmet zarokan, keçikan û xortan bi van her du rêyan di nava xwe de dihelînin, ji bo vê jî malên dewşirmekirinê pêk tînin. Tevî ku bingehe birokrasiya destpêkê bi vî rengî hatiye danîn jî, dîroka şaristaniyê jî ji aliyêkî ve bi vê rêbazê hem qelskirina civakê ye, hem jî çalakiya pêkanîna hêzên amûrên burokratik e: Ango li dijî civakê pêkanîna civakê ye; li dijî civaka xwezayî pêkanîna civaka desthilatdarî û dewletê ye. Di vê pêkanînê de zarok û ciwanên ji civakê bi xwe hatine şûştin bi zîman, çand û dîrokeke din têne perwerdekirin. Armanca bingehî ew e; ciwan û zarok bi rastiya xwe ya civakî re xerîb bikevin. Dikin ku nîkaribin bê desthilatdarî bijîn. Hem madî hem jî îdeolojîk wan dikin xwedî nasnameyekê xwe herî zêde dewletdar dihesibînin. Dewlet û desthilatdariyê ji bo wan dikin rêya bi tenê ya hebûnê. Ev beşên têne dewşirmekirin hem xwe dewlet û desthilatdarî dihesibînin, hem jî bi vî rengî bi civaka xwezayî re dibin dijber. Carnan civakak dewletê û xwezaya civakî wekhev dikin. Ev şaş e, bi nakok e. Dîroka şaristaniyê li ser vê nakokiyê

hatiye avakirin. Ji ber van sedemên dîrokî desthilatdariyan perwerde desteserkirine. Naxwe wezîfeya perwerdekirina civakê xema wan nîne. Sermayedarek karkerên xwe çî qasî perwerde bike, desthilatdarî jî li yên hukim dike bi heman mentiqî karker û evdên xwe perwerde dike. Navê wê burokrasî be jî, endamên wê ji herî jêr heta bi herî jor weke evd tîne perwerdekirin. Nexasim desthilatdariyên dewleta netewe yekdestdariya xwe li ser tevahiya zarok û ciwanên civakê berê pêşî bi rêya perwerdeyê dihûnin. Kesên bi têgihîştina xwe ya dîrok û huner, bi zêhniyeta dînî û felsefî strane êdî ew zarok û ciwanên malbatên xwe yên berê nînin, ew zarok û malên xas ên xwediyê desthilatdariyê ne. Xerîbxistina mezin bi vî awayî bi sazî dikin. Ji aliyê perwerdeyê çîna herî zêde yekdestdariya xwe li ser civaka gel pêk tîne bûrjûvazî ye. Perwerdeya seretayî û navîn mecbûrî dike û wexta dîplomaya zanîngehê bi bîra yên li kar digerin dixê, pêvajoya xistina qefesê û pencê hewcedarkirin û xerîbkirinê yê li ser ciwanên civakê êdî destpêkiriye. Zor, hêza maddî û perwerde êdî bûne sîlehên mêtîngehkirinê yên mirov bi zor xwe li ber wan bigire. Ji lewra mirov bi hêsanî dikare bibêje, di tevahiya dîroka şaristaniyê de civakê herî zêde ji şerê desthilatdarî û dewletê bi amûrê perwerdeyê li dijî wê meşandine

derbên xedar xwarine. Mafê perwerdekirina civakan yek ji wan mafê wan e ku pêkanîna wî herî zehmet e. Li hemberî hêzên dêwane yên dewleta netewe û yekdestdariyên ekonomîk bi rêya perwerdeyê pêkanîna hebûna civakê, ketiye pêvajoya herî zehmet a dîrokê. Hegemondariya îdeolojîk bi şoreşa ragihandinê ya dawî re bi şerê medyayê (mêtingehkirinê bi qasî aliyên eskerî û ekonomîk, belkî jî ji wan jî zêdetir û vedizî dimeşîne) yê li ser tevahiya civakê dimeşîne mêtîngeriyeye çandî ya hê serketîtir ji nû ve rêve dibe. Li dijî vê mêtîngerî û fetha çandî, amûrên bi tenê yên civak karibe pê hebe polîtîka û exlaqê wê bi xwe ne. Divê zanibe bi van amûran li ber xwe bide, ji ber ku rêya bi tenê ya rizgarî û azadiyê ev e. Civaka ciwanên xwe windakirî yan jî berevajî ciwanên civaka xwe windakirî ji têkçûnê wêdetir mafê xwe yê hebûnê bi xwe winda kiriye, îxanet pêre kiriye. Piştî ya mayî rizîn, ji hev belavbûn û tinebûn e. Li dijî vê, wezîfeya bingeîn a civakî ew e, divê amûrên bingeîn ên hebûna xwe saziyên perwerdeyê pêşde bibe. Divê şîroveya zanistî, felsefî, hunerî û zimanî ji aliyê naverokê ve ji avahiya zanista desthilatdariyê veqetîne û di şoreşa maneyê de bi ser bikeve. Naxwe weke din nepêkan e çaviyên polîtîk û exlaqî yên hebûna civakî wezîfedar bibin. Bi vî awayî pirsgirêka perwerdeyê bi xwe saziyên

*(çaviyên) polîtîk û exlaqî yê civakê mecbûrî
dikin û wezîfeya bingehîn a exlaq û polîtîkayê
jî bicihanîna perwerdeya civakî ye. Civaka
nikaribe xwe perwerde bike, nikare saziya xwe
ya exlaqî û polîtîk pêşde bibe û li ser piyan
bigire, her wiha wê nikaribe xwe ji jiyana timî
di tehlûkeyê de, ji hev belavbûn û rizînê xilas
bike.” (RÊBER APO)*

RÊBAZÊN PERWERDEYÊ

Rêbazên ku ji bo dibistan û pergala perwerdehiyê tên bikaranîn, piranî jiberkirina jiyanê bingeh digirin, bi vî awayî bi pergal dikin û bi rê ve dibin. Zanîngeh, ne qadeke ku li ser bingehê heqîqet û pejirandina nasnameya civakî ye, berevajî wê bûye qada înkâr û vederkirinê. Avanî û naveroka zanistê, bi navê obejêktîvîteya rastiya civakê ya dîrokî û civakî bûye bireser ji bo ku civak ji erkên xwe yê bikêr dûr bikeve. Bi taybetî, li ser vê mijarê disekinin û sazûman dikin. Ew sazgeriya ku li ser bingehê şaristaniya tund hatiye sazûmankirin, bi awayê rêzik û formên gerdûnî hatiye pêşkeşkirin.

Yek dikare hilweşandina perwerdehiya zimanê dayîkê û xerabkirina nasnameyê sererast bike. Heya demekê bi alîkariya aboriya taybet ve yek dikare bi malbatên hejar re alîkar be û wan ji wê rewşê rizgar bike. Pêwîst e perwerdehiya fermî û ya zimanê zikmakî azad be. Di vê derbarê de ger dewlet alîkariyê nede jî, pêwîst e ji bo avakirina saziyên gel destkeftiyên wan ên cewherî, derbarê ziman û çandê de astengiyê çêneke. Mafê gel ên xwe bi tevgera hunera azad xwedî bike, nas bike.

Li ser zarokan jî, pergala perwerdehiyê ya ku xwe dispêre mezintirîn zext derewandinê tê avakirin. Hewl didin ku bi rêbazên cur bi cur re hêj di dergûşe de bi pergalê ve werin girêdan. Ew gotina ku dibêje: Di heft saliya xwe de çî be, dê heftê saliya xwe de jî ew be. Vê rastiye radixe ber çavan. Wisa dikin ku nêzîkatiyên civaka xwezayî ya azad di xeyalan de bimîne û tu carî destûrê nadin van xeyalên xwe jiyân bikin. Yek ji erka herî pêroz, xeyalên zarokan ên xwezayî danjiyankirine.

Mijara ku nehatiye destgirtin, kolekirina jinê ya ku çavkaniya xwe ji civaka Sumeran digire ye. Ew girêdana ku bi civaka hiyarerşiyê ve hatiye destpêkirin, di perestgehên rahîban de hatine derbaskirin, di kulubeyên zilam de hatine tepisandin û bi statuyeye herî giran ve hatiye temamkirin. Ji wê serdemê ta niha, bi wê statuyê ve hatiye destgirtin. Bi hemû hest, tevgerên wê û hêza wê ya fikrî ve daxistine asta herî jêr û wêjeya ku çawa xizamtiya zilam bike, bûye mijara perwerde û bingehê exlaqî. Zilamê kole, piraniya xwe bi hêza xwe ya fizîkî ve berhema zêde statu bi dest xistiye. Koletiya ku bi aboriyê ve hûnandine, derdikeve pêş. Jin bi her awayî: bedenî, rûhî û fikirî ve hatiye kolekirin.

Demokrasî, pêwîstiya xwe bi kesên zana û jidil, kesên ku berjewendiyên civakê, selametiya kesî di asta evîndariyê de digirin dest, heye. Ji partiyên wêdetir ên ku civakê zîndî û nûjên digirin, derbarê demokrasîyê de civakê perwerde dikin, civake teşwîqî hişyariyê dikin, heye. Tenê bi hin sazî û rêgezan ve demokrasî nayê birêvebirin. Demokrasî, diyardeyeke zîndî ye ku weke nebata ku tîmî pêwîstî bi avdaniyê (perwerde) dibîne. Ger ji aliyê zarokên xwe yê evîndar ve neyên tîmarkirin, hişk dibe. Wê demê pûçbûn û xwejibîrkirin pêş dikeve, dibe amûr û dikeve bin xizmeta pêşketinê dij-demokratîk.

Di têkoşîna civaka demokratîk de pêwîst e nêzîkatiyeke taybet ji bo ciwanan hebe. Dema ku ciwan ber bi civakbûnê ve diçin, bi pir kemînan re rû bi rû dimînin. Ji aliyekî ve civaka ku bi kevneşopiya bavîksalarî ve hatiyê hûnandin, ji aliyê din ve jî di bin bandora pergala bîrdozî ya fermî de li hev gêjbûnekê jiyan dikin. Ji ber ku ciwan xwedî hêzeke dînamîk in, timî ji nûbûnê re vekirî ne. Ciwan, li hemberî bûyerên diqewimin, ne pijyayî ne. Civaka ku di bin bandora pîran de hatiyê sazûmankirin, ji bo ciwanan çî hatiyê fesilandin; nizanin, keşîf nekirine û ji vê jî dûr in. Li hemberî civaka sermayedar (kapîtalîst) a hişbir û bi dek û

dolaban dagirtî ye, nikare henaseyê(nefes) jî bigire. Ev rastî, dibe sedem ku ji ciwanan re nêzîkatiyeke taybet were nîşandan. Ji bo ku ji xefikên hene werin dûrxistin, pêwîstî pê heye ku li gorî cewherê ciwantiyê perwerdeyên civakî werin dayîn. Ji bo perwerdeya ciwanan pir kar, ked û sebr tê xwestin. Yek dikare bi dînamîk û hêza ciwanan ve destanan binivîse. Dema ku armanc û rêbaz baş hat fêmkirin, wê demê karekî ku nikaribe bi ser bixe, nîne. Dema ku li ser bingehe armanc û bi rêbaz jiyan hat disiplînekirin, bi vî awayî hat dîtin û seferber bû, sebr û rika heye, kêr neke, wê demê dikarin tevkariya doza herî dîrokî pêk bînin.

Kevneşopiya tund a xwedîkirina civakê, yekîneya herî jêr malbat e. Malbat nikare henaseyê bistîne. Bi taybetî, li ser jinê şerê herî mezin tê meşandin. Şaneyeke wê nine ku li hemberî tundiyê necirife. Zarok jî, heman rewşê jiyan dîkin. Bingehe rêbaza perwerdeyê tundî ye. Diyar e ku zarokên bi tundiyê ve hatine terbiyekirin, dema ku mezin jî dibin, ji wan heman tişt tê hêvîkirin. Desthilatdariya xwe li ser tundiyê ava dîkin, vê jî weke xurûrekê ji xwe re dibînin û kêfa wan pir jê re tê. Pêwîst e di civakê de hestên ku xwe dispêre tundî û desthilatîyê, weke nexweşiyên herî xeter bê dîtin û pênasekirin, lê mixabin berevajî vê, weke hestên herî

pîroz û bikeyf tê ragihandin. Diyardeya ku herî zêde were redkirin; hatiye mezinkirin, pîrozkirin û weke dilpakî (erdem) hatiye pêşkeşkirin.

Civaka Rojhilata Navîn pirsgirêkên xwe yê perwerdeyê hene. Ji bo ku ji tundiyê were dûrxistin, pêwîstî bi perwerdeyê berfireh heye. Pêwîstî bi baweriya hêza watedayînê heye. Tundî tenê di demên pêwîst û encamgir de ji bo serfkeftinê bingeh e. Tundî ne tenê şer, şoreş, dij-şoreş e, pêwîst e li gorî her qadê, tundî bi berfirehî were nirxandin, dema ku li dijî wê derketin çêdibe, bi destxistina encamên baş û li gorî wê tundî pêşxistin û pêkanîn, karekî pisporiyê ye. Civaka ku bi hezar salan kevneşopiya tundiyê ve hatiye pijandin, ji nû ve zindîkirina civakê, ji derveyî erka dapîrtiya neçarî û pêwîst, bi çî awayî bawerî bi tundiyê nebe. Diyalog û cihdayîna hêza rêxistinî, derketina ji kaose weke rêbazeke dahûrandin û hizirînê were destgirtin û pêkanîn.

Dewleteke weke Îranê ku xwedî hêz û ceribandinan e; perwerde, hîndekarî, moda, siyaset, dîplomasî, huner û serweriya ku li ser zanistan heye, li ser zimanê Farisî jî bandora xwe çêkiriye. Nîv bi nîv zimanê Erebî, bandora xwe li ser dide çêkirin. Hemû

Rojhilata Navîn nav û nasnavên Erebbî li xwe dikin.

Jixwe kesayeta Kurdan bi sedê salan bi navê Îslambûyînê, di nava cehaletê de digindire. Bi dîmenên ola hemdem a nîjadperestiya Tirkbûyîne re xerabûna kesayetê kûrtir dikir. Di temenên gihiştî de Îslambûyîn, Tirkbûyîn dibe ku were fêhmkirin. Dibe ku pêwîstiyên civakî yên hevgirtinên bi vî awayî watedar be. Lê belê Îslamiyeta bi îbadetên rojane û Tirkîtî, negengaz e ku ji rêzê ve werin destgirtin û bibe mijara perwerdeya hemdem.

Dewletbûyîn û nexweşiya desthilatdariyê, bingehe xwe bi taybetî ji civaka pašverû digire. Keseyatên ku di perwerdehiya zanistên civakî de derbas nebûbe, di wan de desthilatdariyeke pir xeter dide avakirin. Ji bo ku xwe ji aliyê desthilatdariyê ve têr bike, hewl dide ku pirsgireka herî biçuk jî, bi çekê çareser bike. Ev rastî, di kesayetên pašverû de zêdetir derdikeve holê. Bi taybetî, di vê pêvajoyê de, kesayetên hov çêdibin.

Dema Sumeriyan a herî bi heybet, herî dawî li bajarê çandê "Nîpûrê" hatiyê jiyankirin. Mirov dikare bibêje ku perwerdeya akademîk yekem car li vir hatiye

dîtin. Dibêtiyeke mezin, piştî ku ji aliyê Akadan ve tê hilweşandin, şaristanî bi piranî ziman û çanda Akadan digire nava xwe. Bilindbûna bajarê Babîlê, mirov dikare weke destpêka dema şaristaniyeke nû bigire dest.

Şaristaniya Yewnan, piraniya hêmanên xwe ji çanda Med û Persan wergirtiye. Jihevqetîna Rojhilat û Rojava, di vê demê de derdikeve pêş. Di navbera wan de hevkarîyeke zêde heye. Pir kesên Yewnanî, di qesrên Persan de erk digirin, bi hezaran leşkerên bi pere cih dibin. Berhevkirinên dewlemend û desthilatdariya wan a du sed salî ya li ser qada Egeyê bû sedem ku Yewnanî li hemberî Persan di asta hêrs de li dijî wan liv û tevgerê pêş bixin. Ji bo ku desthilatiya Persan bişkînin û dewlemendiya wan desteser bikin, ev tevger anîn asta armanceke nîjadî. Weke Herkûlê nû, derketina Îskender ne jixweber e. Îskenderê ku ji vê rewşê para xwe werdigire, di perwerdeya Arîsto re derbas dibe. Li hemberî çewisandinê û li dij derketina pîrsgirêkan, tevlihevî heye, li ser felsefeya Yewnan bandoreke xwe daye çekirin. Jixwe bandorbûyîna ji mîtolojiyê pir zêde ye. Ango çandê berxwedaniyê dane avakirin. Mirov dikare bibêje ku sepandinên ku Medan li ser Asûriyan daye meşandin, heman tişt Yewnanan jî li ser Persan pêk anîne.

Îskenderê ku bi eslê xwe Makedonî ye, lê zarokê çanda Yewnan, împaratoriya Persan weke qesreke ku ji qaxezan çêbûye, hilweşand. Bi vî awayî, parçekirina împaratoriya Persan bingehê xwe ji çanda berxwedaniya sedê salan digire. Raveya senteza felsefeya ronakbîrî û qêbîleya azad a Makedonî dike.

Perwerde, ji dibistana seretayî dest pê dike ta zanîngehê, hedefa wan ji bo ku mirov bike hemwelatîyê saziya nûjêntîyê ya herî bibandor. Di vê mijarê de bi saziyên leşkerî re di nava pêşbirkê de ye. Guherîn, veguherîn û pêşketinên ku di civaka dîrokî de berdewam dike û nirxên ku dane avakirin, destpêkê di parzûna olperestîyê de, piştê ji ya nîjadperestîyê re derbas dike û di nava bîrdoziya fermî de dihelîne û distirîne. Armanca van saziyan, afirandina hemwelatîyên herî gêj û bêfehîm e. Di vê derbarê de feqîtî, skolastîk serdema navîn pir pir bi şûn xwe ve hiştiye.

Nûjêntiya sermayedar, ji bo ku tenduristî û perwerdeyê bi netew-dewletê ve bike, jiyanî digire dest. Dixwaze van her du qadan bixe bin serweriya xwe. Ji ber ku tenduristî û pêşketina ronakbîrî, ji bo hebûna civakê mijarên bingehîn in. Heya ku van her du qadan negire bin desthilatdariya xwe û li

ser van qadan yekdestiya xwe ava neke, ne gengaz e ku bi awayekî giştî serweriya xwe bide meşandin. Dizane ku bi mîltarîzma vekirî, nikare bi zorê civakê bike milkê xwe. Desthilatdariya li ser perwerde û tenduristiyê, ji bo yekdestiyê girîngiyeke xwe ya awarte heye.

Ji aliyê etîk (teoriya exlaq) û estetîkê (teoriya xweşîkbûnê) ve berpirsiyariyên jinan zêdetir in. Perwerdekirina mirov aliyên wê yên baş û nebaş, girîngiya jiyan û aştîyê, xerabî û hovîtiya şer, nirxandina pîvanên dadî û mafdarî, diyarkirin û biryarkirina wan, ji bo civaka exlaqî û polîtîk jin zêdetir dikare bi berpirsiyarî û rasteqînî nêz bibe. Ji ber ku xwezaya jinê van taybetmendiyan di nava xwe de dihewîne. Bê guman, ez qala jina ku bûye siya zilam nakim. Jina ku azadî, wekhevî û demokratîkbûyîna fêhm kiriye, dikim.

Saziyên siyasî, akademî û çandî dikarin van erkan bigirin ser milên xwe. Ji bo pêwîstiyên ji nû ve avakirinê, yekeyên civaka exlaqî û polîtîk werin pêşwazîkirin, akademî dikarin ji aliyên rewşenbîrî (entelektuel) û zanistî ve bi wan re alîkar bin. Cihê ku saziyên fermî û yekdestî ji xwe re mînak bigirin, derketinên resen bidin çêkirin, guncavtir e. Lasayîkirina (taklît) saziyên nûjentiye, dibe ku encamên neserkeftî bi xwe

re bîne. Pêwîst e xweser û demokratîk bin, bername û kadroyên xwe bidin avakirin, xwendekar û mamosteyên ku hene ji dil û bi xwestek bin. Pergaleke wisa were avakirin ku mamoste di heman demê de xwendekar, xwendekar jî di heman demê de mamosteyî bikin. Ji şivanê sere çiya, ta pisporekî xwedî angaşt û her kesê ku xwedî angaşt karibe tevlîbûna xwe bide çêkirin. Akademiyên jinan jî, di heman çarçoveyê de li gorî rastiya jinê aliyên zanistî derxistina pêş, dibe ku guncavtir be. Ji bo ku tenê teorîk nemînin, pêwîst e ji aliyê çalakbûnê ve jî tevlîbûna xwe bidin çêkirin. Di sazîkirin û bikaranînên akademyan de pêwîstiyên pratîkî li ber çavan werin girtin û li gorî vê werin sazûmankirin. Di dîrokê de mînakên bi vî awayî (li ser lûtkeyên çiyayan agirgehên Zerdeşt, bexçeyên Eflatûn û Arîsto, peyaderên kolanan ên Sokrates û Stoayî, dêrên serdema navîn û dergeh) xwerû û jidil hatine avakirin. Mirov dikare ji çiyayan bigire ta kolanên taxan, mekan were hilbijartin. Bê guman, pêwîst e avahiyên ku di bin nîşana mezinbûna desthilatîyê de, neyên hilbijartin. Di dêr û dibistanên medenî de pêvajoyên perwerdeyê, li gorî rewşa endamên ku tevlî dibin û tevlîbûna xwendekaran dikare were diyarkirin. Pêwîst nake ku weke saziyên fermî, demên teqez

werin diyarkirin. Bê guman, bê rêzik û destûr jî nabe. Teqez pêwîstî bi rêzikên exlaqî-etîk û estetîkê hene.

Tê zanîn ku di hin beşên Zîgûratan de jinan weke tişteki evîniyê rista xwe lîstiyê. Bi ser de jî ji bo keçên malbatên herî başbûyîna weke tişteyek(nesneyek) evînê, payeya rûmetê hildigire. Keçên hatine hilbijartin û yên taybet, derbasî wan deran dikirin. Di sazûmaniya rahîban de pêşkeşkirina jinê, heybetdar e. Di Zîgûratan de bi sazûmaniya qesran a hemû şewazên perwerdeyên xweşbûnê re derbas dibûn. Jin, di hin pîrozbahiyên de (huner û mûzîk) gihiştine asta pisporiyê. Zilamên hilbijêr ên ku ji qadên derdorê dihatin, di perestgehan de ji wan re jin dihatin pêşkeşkirin. Dema ku bi hin kesan re lihevhatinek hatibûya çêkirin, bi wan re dihatin zewicandin. Rêbazên bi vî awayî, hem deramet(hêz, qudret) hem jî bendêra(alem) parezgahan zêde dikir. Zilamek, ji bo ku jinekê ji perestgehê bigire, pêwîst e ji malbateke baş û xwedî nirx be. Her wiha, ji ber ku ev jin di perwerdeyên perestgehê re derbas bûne, ji bo xwe bi civaka nû-dewletî girêbidin, di nava qebîleyên nû de nûnertiya pîroztiyên perestgehan dikirin. Bi awayekî din, jin ji bo civaka rahîban-dewleta nû, rewşa sîxurtiyê jiyân dikin. Di serî de Îsraîl, hê jî di pir

dewletan de ev rêbaz tê bikaranîn. Bi vê şêwazê, hunera kolekirina jinê prototîpa karxaneyan e. Ew xwedawenda ku di perestgehan de pîroz û jina evînê bû, wê veguhere jina karxaneyan a bêçare û ya ku xwe bazar dike û di rewşa herî xerab de ye. Civaka Sumeriyan ji ber vê rewşê, dibe xwediyê rûmet, an jî bêrûmetiya destpêkê.

Bêrûmetkirina jinê, ne wekhevî, bêperwerdebûna zarokan, şerê nav malbatî û pirsgirêka namûsê. Ev hemû, bingehe xwe ji malbatperestiyê werdigirin. Pirsgirêkên desthilatî û dewletê, weke maketeke di nava malbatê de hatiye avakirin. Ji bo ku desthilatî-dewlet-çîn û civak were fêhmkirin, pêwîst e malbat baş were dahûrandin.

Nûjentî, ji bo avakirina netewekirinê, perwerde ye, weke amûreke herî bingehîn bi kar tine. Lê belê netewên serdest, bi pergala perwerdeyê re ji bo ku Kurdan ji dîrok û nasnameyên wan ên civakî dûr bixin, hîn di dibistana dayîkê de perwerdeya mandelekirinê didin destpêkirin. Armanca perwerdeyê, avakirina civakîbûyîna ye. Lê ji bo ku Kurd ji nasnameya xwe ya cewherî û civakîbûyîna xwe dûr bikeve, hêzên desthilatdar perwerdeyê weke amûrekê li hemberî Kurdan bi kar tînin. Perwerdeya

zimanê dayîkê, di pir parçeyan de hatiye qedexekirin û li cihê wê zimanê netewên serdest tên bicihkirin; li şûna ku zimanê dayîkê ji bo civakîbûnê were pêkanîn, berovajî wê dibe hincetek ku ji civakîbûna xwe bireve. Li şûna ku çand û Kurdewariya xwe bigihîne hişmendiya xwe, anîne rewşa nîşaneyê radestbûna çanda neteweya serdestan

Di jiyana civakî ya nûjentiye de pergala perwerdeyê ya dij-civakîbûnê, bi gihandina kesayetên ezezî re hatiye erkdarkirin. Hem jiyana ezezî ya liberal, hem jiyana hemwelatîyên neteweya dewletê, li gorî pêwîstiyên kapîtalîzmê tê sazûmankirin û pêkanîn. Bi vê armancê, mezintirîn pîşesazîyên sektorên perwerdeyê hatine avakirin. Tekakes, di van sektoran de 24 demjimêran hem ruhî hem jî zihnî di bin bombeyanê de û bi vî awayî hebûneke dij-civakî didin afirandin. Ev kes, ji exlaq û polîtîkîbûnê tîndûrxistin. Takekes anîne asta kesên ku şelafîya(dalkavukluk) desthilatîyê dikin, ên li pey mesrefên rojane dikevin, perexwer, beredayî û neteweperst. Bi riya kesayetên bi vî awayî, xwezaya civakî ji kok ve tê xerabkirin. Nûjentiya sermayedar, perwerdeyê ne ji bo sazûmankirineke bi tenduristî bi kar tîne, ji bo hilweşandina civakê bi kar tîne. Derbarê jiyana civakî de

dahûrandinên ku werin pêşxistin, gihîştîye
sînorên “An Civak, An Nebûn” e

ŞÊWAZÊN PERWERDEYÊ

Rastiya rastiyan civakî rastiyan ku hatine çêkirin in, mijareke ku zanyarên civakî tim û tim dubare dikine ye. Ev çêkirin bi destê mirovan hatine çêkirin. Ji tevahiya van çêkirinan re ‘çand’ tê gotin an jî çandê pêk tînin. Mirov van rastiyan civakî yan di jiyanê de afirandî, bi perwerdeyê pêş dixê û ji siberojê re, ji nifşên piştî xwe re radigihîne. Her wiha bi perwerdeyê ev afirandin tene komkirin û vediguherînin rastiyan nû. Rewşa ku jê re pêşketin tê gotin jî ev e. Wekî ku me diyarkirî motora pêşketinê perwerde ye. Tiştê ku ji, “perwerde veberhênana ji bo pêşerojê tê kirin” armanca tê kirin jî tam ev e.

Nexwe wê demê pêwîst e mirov bersivan ji pirsên weke perwerde çi ye, çima pêwîstî bi perwerdeyê tê dîtin, perwerdeyê meyleke dîrokî ya çawa şopandiye û hwd. bigere.

Eger em bi rastiya zanist bi têgihanê çêkirin bikevin rê, em jî bi destgirtina etîmolojîya peyva perwerde dest pê bikin. Peyva perwerde ji peyva “educere” ya Latînî tê. Peyva educere ji bo gihandinê û xwedîkirina nebat, lawirê û zarokanê bikaranîn. Hemû çalakiyan di derbarê xwedîkirinê û gihandinê de dikevin nava

mijara perwerdeyê. Di Tirkî de jî perwerde(egitim) ji bo vegotina çalakiyên cuda tê bikaranîn. Di Tirkî de peyva perwerde ji koka lêkera tewandinê tê. Ev jî tê wateyên, tewandin, fêrkirin, girtina bin serweriya xwe, binxistin, şkandin û beralîkirinê. Dema ku beşdarbûna Tirkan a dîroka şaristaniya biçîn jî di nav de bê hizirîn perwerde di wateyên weke tewandin, şkandin, fêrkirin, binxistin, xistina bin serweriyê de tê fêmkirin. Di zimanê Tirkî de perwerde bi wateyên xistina bin kontrol û kolekirinê re hevwater ye. Îro jî biwêja, “Min dursa wî dayê” di wateyên lêdan, lêxistinê re tê bikaranîn. Di rastiyê de ev yek feraseta perwerdeyê ya şaristaniya biçîn û dewletdar e. Di Erebî de perwerde di çalakiyên pir cuda de tê bikaranîn. Di Erebî de beramberê wê ‘tedrîb’ e. Tedrîb jî tê wateya ‘terbiye’ yê. Ango perwerde terbiye ye. Wateya perwerdeyê ya Kurdî jî ‘perwerde’ ye. Perwerde ji koka per-wer-kirinê tê û tê wateya geşkirin, xweşkirin, xwedîkirin, fêrkirin, hînkirinê re hevwater ye. Wateya wê nêzîkê dema civaka xwezayî ye. Di aliyê civakê de ev wate hîn nêzîktirê rastiyê ye. Nexwe wê demê du wateyên etîmolojîk ên perwerdeyê hene. Dema ku wateya yekemîn şkandin, tewandin, fêrkirin, binxistin, xistina bin kontrolê û beralîkirine, ya din jî gihandin

û terbiyekirin e. Di aliyê civakê de wateya perwerdeyê ya rastî ya duyemîn e. Ango li ferd û civakê nêrîn, gihandin, terbiye û pîvan qezenckirin dibe.

Pirsa bingehîn a li vir, kî wê li civak û ferd binêre, bigihîne, pîvan û terbiyeyê bide, wê ev şêwedayîn çawa çêbe? Bersiva van pirsan, wê çawaniya perwerdeyê jî nîşan bide. Di rastiyê de bersiva vê pirsê wê di heman demê de paradîgmaya ku nêrîngeha cîhanê ye jî diyar bike.

Paradîgmaya ku nêrîngeha jîyanê ye, di heman demê de nêzîkatiya li perwerdeyê jî diyar dike. Divê perwerde armanca jîyanê ya bibe azadîxwaz a dibe heqîqetê be, yan jî divê tewandin, şkandin, binxistin, xistina bin kontrolê ya tê wateya pêşxistina serdestiyê be. Di aliyê civaka demokratîk de armanca perwerdeyê ghiştina agahî û heqîqeta jîyanê ye. Di aliyê şaristaniya dewletdar û biçîn de jî perwerde tehekum e. Ev ciyawaziyên di armancan de, di rêbazan de jî ciyawaziyên çêdike.

Piştî vê nirxandina giştî eger mirov li dîroka perwerdeyê binêre, mirov dikare şopên her du nêzîkatiyan jî bibîne. Em vê di destpêkê de bidin diyarkirin: Dîroka perwerdeyê bi qasî dîroka mirovahiyê kevin

e. Ji ber wê yekê dîroka perwerdeyê bi dîroka mirovahiyê bidin destpêkirin û gengaz e ku mirov pêşketinên erênî-neyênî yên di dîroka mirovahiyê de heyî di dîroka perwerdeyê de jî bibîne. Heyanî eger ku mirov hinekê pêşde biçê vedîtin û nîşaneyên zanistî yên ku di lawiran de pêvajoyeke perwerdeyê ya girêdayî ajoyên hindirîn didin nîşandan heye. Çûkek ji fêrxika xwe re çawa fêrbûnê, mêşeke hingivîn ji fêrxika xwe re çawa hingiv çêkirinê, seyê avî ji têjika xwe re çawa bend li pêşiya avê çêkirinê û hwd.. didin fêrkirin. Ev fêrbûn di lawiran de pir bi lez e. Wekî ku di mirovan de ne wisa bi lez e, di aliyê çawaniyê de jî cuda ye. Heya astekê mirov bi ajoyên xwe yên hindirîn, piştê jî bi aqlê xwe, xwe fêr dike. Ango mirov bi aqilê xwe ji zindiyên din cuda dibe. Lê aqil tenê cewher anga potansiyel e. Pêwîst e vê potansiyelê, cewherê bide xebitandin. Nexwe ti wate û girîngiya xwe namîne. Aqil jî potansiyeleke tenê bi rêya perwerdeyê aktîf dibe ye. Ev yek jî tenê bi rêya lêpîrsînkirin, rexnekirin, vebijêrkên wê dîtî û ya herî di cih de ji nava van dîtî û bi guhertina wê gengaz e.

Mirovê ku weke cureyê cuda pêşketî li hemberî bûyer û diyardeyên li derdora xwe pir bi baldar nêzîk bûye, çavdêrî kiriye û encam jê derxistiye. Pêwîstî bi çî dîtibe berê xwe daye wê û pêşketinên mezin bi dest

xistiye. Bi derbasbûna jiyana civakî re hîn zêdetir girîngî daye vê rewşê. Ev rewş jiyana wan hîn hêsantir kiriye. Bi civakîbûnê re hişê hevpar ango tiştê ku jê re çand tê gotin pêk hatiye. Jin-dayîka

ku civakîbûn avakirî ev hiş û çanda hevpar ji nifşên nû yên digihêjin re ragihandiye. Di wateyekê de jin-dayîk mamosteya destpêkê ye. Lê belê jin-dayîk ev ragihandin ne ji bo ji nû de çêkirinê ji nifşên nû re ragihandiye, ji bo wan ji jiyânê re amade bike, ragihandiye. Nexwe her roj pirsgirêkeke nû, vedîtineke nû, pêşketineke nû tê jiyankirin. Dubarebûn ji van pirsgirêk, vedîtin û pêşketinan re nikarin bibin bersiv. Ji ber wê yekê ragihandin ne ji bo jiberkirin dayîna çêkirinê ye. Ango tenê zanyariyan nadin. Hewl didin ku jiyânê bi xwe bidin fêrkirin. Di çavkaniyekê de wiha tê nivîsandin ku Îmanûel Kant di derseke xwe de ji xwendekarên xwe re wiha xîtab dike û dibêje; “hûn ê ji min ne hizirên amade fêr bibin, hûn ê hizirînê fêr bibin.” An jî gotina, “masiyan nedin ti kesî, masîgirtinê fêrî wan bikin” ji bo Mao tê gotin jî di heman şeweyê de ye. Di rastiyê de ev hizirên ku armanca bingehîn a perwerdeyê didin nîşandan îfadeya şewaza jiyana civakî ya civaka xwezayî ye. Mekanên jin-dayîkê ku bi xwedîkirina nifşê nû, gihandin û

terbiyekirina wan re, pîroziyê qezenc dikin piştire dibin perestgeh. Peywira perestgehan di civaka xwezayî de ev e. Di heman demê de ev perestgeh di rewşa dibistanên demê de ye. Dubare bidin diyarkirin ku; armanca van perestgehan ne tenê zanyarîdayîn e, armanca wan ferdan ji jiyanê re amade kirine. Dema ku M. A. Ferrière digot, “Dibistanên ku tenê zanyarî didin, divê ji holê bêne rakirin” bêyî ku di ferqê de be, rastiyeke heqîqetê vedibêje.

Bi şaristaniyê re, belavbûna çînan a civakê bandora xwe di perwerdeyê de jî dide nîşakirin. Ji bo hêzên dewletdar û biçîn ên dixwazîn civakê bigirin bin tehekuma xwe û hukim li ser wan bikin, perwerde amûra pêşwazîkirina pêwîstiyên xwe, gotinên xwe weke heyî ji kesên din re kopîkîrinê ye. Ji ber ku taybetmendiyan weke, lêpîrsîner, rexnegir, beramberker, di jiyanê de diceribîne, ji bo xwe bi tehlûke didîtin xwestine ku ji holê rakin. Li şûna vê jî sîstemeke jiberkirin û dubarekirinê ya lêpîrsîn nake, rexne nake, wekî heyî qebûl dike, di jiyanê de nehatî ezmûnkirin û ceribandin ava kirine. Bi vî awayî mirov ji hizirînê qut dikin. Hizirînê tînin rewşa taybetmendiyeke wekî ku tenê ya mirovan e. Tiştê ku dikeve ser milê mirovan jî gotinên xwedayan pêk anîne. Eger aqil jî bi hizirên

xwedayan re bigunce, wê demê bi qîmet dibe, nexwe ti qîmeteke ya aqil jî nîne, heyanî wekî ku ji rê derketiye tê cezakirin. Dîrok bi belgeyên vê re tijî ye. Bi vî awayî derizîna di civakê de bandora xwe li perwerdeyê jî dike. heya roja me ya îro jî hebûna xwe dide berdewamkirin.

Hêzên tehekumkar û çewsîner ên ku serdestiyê di destê xwe de digirin, tim modela perwerdeya duyemîn bingeh digirin. Ev hêzên tehekumkar mekanên pîroz û perestgehên ku rola dibistanên ferd ji bo civakê amadedikin vediguherînin zîgûratên ku lê burokratên xwe digihînin. Eger ku mirov bibêje sîstemên dibistanên îro bûne zîgûrat wê ne zêde be. Li beramberê vê, civak jî dev ji perwerdeya ku hewldana xwe ji jiyane re amade kirine, bernedane.

Nivîskarê pirtûka “Dîrok ji Sumeran dest pê dike” û yekem Sumerologê di cîhanê de Samûel Noah Kramer behsa dibistanan dike. Di tableteke ku hatî derxistin de wiha hatiye nivîsandin. “Min tabletên xwe ji ber xwend, xwarina xwe xwar, tableta xwe ya nû amade kir, min ew bi nivîsê tijî kir û xilas kir; piştî ji min re ji ber kirin û piştî nîvro jî xebata nivîsê hat nîşandan. Piştî dibistanê çûm malê, ketim hindir, min bavê xwe bi awayê rûniştî dît. Min behsa xebata xwe ya

nivîsê kir, piştire min ji bavê xwe re behsa jiberkirina tableta xwe kir, bavê min jî keyfxweş bû... Dema sibehê zû rabûm min ji diya xwe re got ku: “Xwarina min bide min, divê ez biçim dibistanê.” Diya min ‘du nanên biçûk’ dan min û ez çûm dibistanê. Li dibistanê çavdêrê xizmetê ji min re got, ‘Çima tu dereng hatî?’ Di rewşeke tirsîyayî û bi awayekî ku dilê min lê dide de derketim pêşiya mamosteyê xwe, min xwe li pêşiya wî tewand û min ew silav kir.” Piştire derbarê sîstema perwerdeya Sumer de çavdêrî û rexneyên xwe dinivîse. “Dibistanên Sumeran ji dilkêşiyê dûr bûn. Bernameyên wan zehmet, rêbazên perwerdeyê jî çav ditirsand û disîplîna wê jî bêrehm bû. Eger xwendevan di firsenda destpêkê ya didîtin de ji dersan direvîn û rasterast ji rêya ‘rast’ qut bibin mirov wê çawa ji vê rewşê şaşwaz bibe? Vaye ev me dibe yekem bûyera sûcê ciwanan di dîrokê de hatî qeydkirin.

Di pedagojiya Sumeran de bi ti awayî karaktereke pêşxîner a ku mirov weke perwerde bi nav bike nîne. Di mijara disîplînê de şiv ne xweşbînî bûn. Wer xuyaye, mamoste ji bo ku xwendekarên xwe teşwîqê xebateke baş bikin, ji bo xeletî û kêmasiyên wan sererast bike piştî xwe didan qamçîyan. Jiyanêke xweş a xwendekaran nebû.”

Ev tablet û şîroveya şaristaniya Sumer a ji beriya 5000 hezar salan heyî bi gelek aliyên xwe ve hêjî hebûna xwe didomîne . Heman nivîskar di beşên pêş ên pirtûka xwe de wiha dewam dike. “Dibistanên Sumeran hîn zêdetir gihandina nivîsevanan armanc dike. Di van dibistanên ku tenê zarokên kur digihîne de xwendekar fêrî li ser tabletan nivîsandina mîxî nivîsînê dibin. Endamên perwerdeyê yên dibistanê ji mamosteyê ku jê re “bavê dibistanê” tê gotin, ji alîkarê mamoste yê ku jê re, “kek”, “erkdarê wêne”, “erkdarê Sumerî” û “erkdarê qamçî” pêk tê. Sîstema perwerdeyê ya dibistana ku nivîsandin û bikaranîna zimanê Sumerî fêr dike, gotinên zimanên xwe bi şêweyê peyvên di aliyê wateyê de bi hev ve girêdayî û komên biwêjan bi ref dikin û van bi xwendevanan didin jiberkirin, di rewşa rêbazeke ku xwe dispêre dubare, dubare kopyekirinê.”

Sîstema perwerdeya Sumer a ku bi şêweyê zêde kêrhatin, behremendî, xwestekên mirovan li ber çavan nagire, tenê bendewarî, daxwazên hêzên tehekumkar bi cih tîne hatî bernamekirin, bi hinek guhertinên şêweyî heya roja me ya îro hatiye. Di paradîgmaya vê perwerdeyê de pêşxistina kêrhatinên mirovan ne zêde girîng e. Hêza xwe ya xeyalan derxistina holê dibe mijara henek pêkirinê. Ciyawazî nayên qebûlkirin,

dubarebûn esas e. Rewşeke trajîkomîk e. Teoriyên Albert Einstein'ê ku bi hênceta bê aqil e ji van dibistanan hatî avêtin, di van dibistanan de weke materyalên perwerdeyê tê xwendin.

Di vê perwerdeya ku di dema Sumeran de anîne rewşa paradîgmayê de, doktrînên mamoste, dibistanê bingeh têne girtin. Ti roleke cidî ya xwendekar nîne. Wiha nêzîkatî li xwendekaran tê kirin; “ev wiha ye, ji ber ku wiha ye hûn neçar in ku fêr bibin, çima hûn fêrî van bibin, hûn ê çawa û li ku derê bi kar bînin jî qet pirs nekin!” Tê gotin ku ji vê re zanyariya mutlaq a ji xwendekaran re tê dayîn weke zanyariyên herî rast ku pêwîst e neyê lêpirsînkirin, lêpirsînkirina wê mirov ber bi cihên şaş û ji rêderketinan ve dibe. Di rastiyê de vê yekê ji bo bi hêsanî rêvebirina civakê dikin. Ji ber ku mirovê lêpirsîn dike, pirsan dike bi hêsanî nayê rêvebirin. Lê belê di vê sîstema xwe dispêre dubare û jiberkirinê de, lêpirsînkirin, pirsîkirin tine, bi awayekî çavgirtî ji tiştên ku têne gotin re îtaetîkirin heye. Ev sîstem ji îtaetê re vekirî ye. Ev rêbaz karê dibistan û mamosteyan pir hêsan dike. Lîsteya tiştên ku divê bêne jiberkirin li dibistanan tê belavkirin, ji xwendevanan jiberkirina van dixwazin, yê nîkarin ji ber bikin jî têne cezakirin. Di rastiyê de ev şêweyê bingehîn ê ku

desthilatdariya siyasî serî lê didine ye. Desthilatdar helbestên zagonan ên ku jê re dibêjin qanûn ku di rastiyê de xwestek û berjewendiyên xwe amade dikin û li ser civakê didin ferzkirin. Ji civakê pêkanîna van tê xwestin. Kesên ku pêk nayînin jî ji aliyê leşker û polîsan ve têne tehdîtîkirin an jî têne cezakirin. Vaye ev rêveberiya hêsan e.

Yunan û Romayîyan ev rêbaz pêk anîne. Weke mînak di dibistanên Roma û Yunanan de dersên mantiq hatine dayîn. Armanca van dersan, ne ji bo di xwendekaran de pêşxistina mantiqekî yan jî di jiyana wan a rojane de hêsanî dayîna çêkirine. Tiştên ku di dibistanên Yunanan de bingeh tê girtin, bi xurtkirina masûlkeyên mirovan re disîplîne kirine. Weke mînak werzîşvanekî ji bo masûlkeyên xwe bihêz an jî disîplîne bike çawa perwerdeya laş pêk tîne, xwendekar jî dersa mantiq ji bo vê yekê didîtin. Ango ji bo xurtkirin û disîplînekirina zêhn dihat kirin.

Ev sîstema perwerdeyê jî hema hema di hemû olan de jî weke heyî hatiye girtin û pêkanîn. Li gorî van xweda tiştên herî baş fikiriye, bi rêya wehiyan ji pêxemberên xwe re ragihandiye. Pêxemberan jî ev yek bi rêya pirtûkên xwe ji cemaet, ummeta xwe re dane zandin. Fikirîna tiştên ji derveyî vê guneh in, munafiqî ye, zindiqî ye, berdêla vê jî di

dojehê de şewitîne. Jixwe girtina Gazalî ya deriyê îctîhadê jî ji vê rêûresmê tê. Eger aqilê mirovan ji tiştên ku xwedê û pêxember dibêjin bigire, baş e. Eger nagire ne tiştên ku Xwedê û pêxember dibêjin, aqil şaş e û aqil tê lêpirsînkirin. Rêya herî baş a zanîna perwerdeya baş û bi xêr a ku bi Kurdî jê re dibêjin zanista 12 ilimê bêyî şîrovekirin, lêpirsîninkirinê gotinên xwedê û pêxember ji ber kirin, hefz kirine. Kesê ku jiberkirina herî baş dike, kesê herî baş e. Ev rewş pêşketinê disekinîne, aqil û lêpirsîninkirinê disekinîne, dogmatîzmê kûrtir dike ye.

Her çi qas hewl dane ku bi Ronesansê vê nêzîkatiya dogmatîk derbas bikin

jî, burjuwaziya ku di demeke kurt de desthilatdarî xistî destê xwe de, ji bo xwe domdar bike, hemû mekanên perwerdeyê yên weke dibistan û zanîngehan bi dest xistine, anîne rewşa propagandaya xwe bike. Bi vî awayî perwerde anîne rewşa çeka herî bihêz a di destê desthilatdariyê de. Perwerdeya ku di bin xizmeta netew-dewletê de bi desthilatdariyê re bûyî yek, ji exlaq û wijdan qut dibe. Vediguhere sîstemeke peywendiyên berjewendiyan pêş dixê. Mirov ne ji bo ji pêşketina civakî re têkariyan bikin, perwerde anîne rewşa hîn zêdetir kar bi destxistinê. Ango pîvana perwerdeyê, ji exlaq

û wijdana civakê daketiye, veguheriye ka wê çî qas pere bîne. Dibe ku ev rewş di dîroka civakan de qirkirina herî mezin be. Bi navê perwerdeyê perwerde qetil kirine. Nirxandina J.J.Rousseau ya “ez zarokekê teslîmê we dikim. Ne ji bo bibe bijîşk, dozger, rahîb, ji bo bibe zilam ango bibe mirov teslîmê we dikim.” Dide nîşakirin ku ev tehlûke dîtiye. Destnîşankirina “heyânî dil neyê perwerdekirin, mejî nayê perwerdekirin” bal dikişîne ser vê rewşê. Ango perwerdeya di sîstemên şaristaniyê de perwerdeyeke jiberkirinê ya ku aqil û wijdanê ji hev cuda dike, berjewendiyê derdixe pêş, pragmatîst, ji ber ku pêşî li lêpirsîn û rexnekirinê digirin xuluqkariyê di kuje ye. Di perwerdeya hinek welatan de çend gavan li pêşbûna wan vê rastiye naguherîne.

Di civaka demokratîk a li hemberî şaristaniya dewletdar û biçîn li ber xwe didin, xwestine ku feraseta perwerdeya xwe pêş bixin. Ji ber ku di bin êrîşên hêzên şaristaniya dewletdar û biçîn de dimînin, pîranî caran li cihên veşartî, di binê erdê de yan jî li qadên zehmet de berdewam kirine. Di van perwerdeyan de armanca bingehîn dil û mejî bi hev re perwerde kirin û mirov ji bo civak û pêşerojê amade kirine. Di vê wateyê de jiyan bi xwe dibe perwerde. “baş bihizire, xweşik

bibêje, rast bike” a ku di atesgedeyên Zerdeşt de tê fêrkirin pîvana bingehîn a perwerdeya civaka demokratîk e. Ev perwerde perwerdeyeke li gorî pêwîstiyên civakê şêwe digire ye. Çavkaniya xwe ji pêwîstiyên jiyane digire. Lê li gorî feraseta perwerdeyê ya şaristaniya biçîn û dewletdar ti girîngiya tu çi dibêjî, çi dixwazî, kêrhatinên te nîne, ya girîng xwesteka xwediyên desthilatdariyê ye.

Perwerdeya demokratîk bi qasî ku nayê daxistina nêzîkatîparêziyê berfireh e. Ya rastî feraseta perwerdeya demokratîk bi her qadên jiyane ve eleqedar dibe. Di vê wateyê de divê di taybetmendiya jiyane hêsantir dike, xweşik dike, bi wate dike de be. Ji bo vê divê di şêwazeke bihizire, lêpîrsîn bike, rexne bike, çareserî ji pîrsgirêkan re bibîne û xuluqariyê bingeh bigire de be. Heyanî divê di asta pêşî li derketina pîrsgirêkan bigire, bi ziravî bibîne û tedbîrên xwe bigire de be. Sîstema perwerdeyê ya kêrhatin û jêhatin, asta fêmkirina wan, cudahiya pêşekiyên mirovan hesab dike, perwerdeyeke demokratîk e. Nexwe taybetmendiya demokratîk a perwerdeyên bi reçeteyên hazir ji herkesî re tê dayîn lewaz e.

Rewşeke ku di perwerdeyê de pêwîst e çi bê dayîn, pêwîst e xwendekar çi bê zanîn û divê çi curên zanyariyan bê dayîn qet ne

demokratîk e. Hêzên desthilatdar xwe bi xwe biryara pirsan didin û weke lîsteyekê diyar dikin û ji hemû mamosteyên pêkanîna van di dibistanê de tê xwestin. Di vê rewşê de xwendekar di rewşeke pir pasîf de ne. Jixwe desthilatdar avakirina civakeke pasîf armanc dike. Lê belê di ferasetêke perwerdeyê ya civakeke demokratîk armanc dikin de ev tişt çênabin. Li şûna vê sîstemeke perwerdeyê ya xwendekar digire nava navenda xebatên perwerdeyê, peywendiya xwendekar û mamoste hatî derbaskirin, divê hêsanker an jî alîkar be. Li gorî Sokrat divê mamoste tenê rola pîrikê bilîze. Pêwîst e mamoste ne ji bo xwendevanan bi xwe bide bawerkirin, ji bo aqilê wan bide şiyarkirin Nirxandina Rêbertî ya “Di akademyên min de têkiliya mamoste xwendekar tine” tam jî vê îfade dike. Pêşketin û xurtbûna xwendekaran tenê bi vê sîstemê gengaz dibe. Pêşketina xwendekarê ku tenê guhdarî mamoste dike, lêpîrsîn nake ne gengaz e. Şêx Bedredîn dibêje, “xwendekarê ku mamosteyê xwe derbas neke tê wateya ku îxanet li zanistê kiriye.”

Ev rewşa derbarê perwerdeyê di dîrok an jî civaka Kurdistanê de dîtin gengaz e. Di van xakên ku derbasbûna jiyana civakî û navenda bingehîn a neolîtîkê ye de perwerde ji bo gihiştina wateya jiyânê û ji bo jiyânê re amadekirinê ji aliyê jin-dayîkê ve hatiye

dayîn. Perestgehên jina xwedawend û Îştarê mînakên vê ne. Lê dagirkirina Kurdistanê ji aliyê hêzên dewletdar û bi çîn ve ev yek hatiye guhertin. Tişta destpêkê ya ku piştî dagirkeriyên leşkerî kirine. Destdanîna ser van perestgehan û ji cewherê wan dûrxistin bûye. Mekanên pîroz ên dayîka xwedawend veguherindine cihên îdeolojiya xwe û bi vî awayî anîne rewşa xistina civakê. Vê rewşê civak xirab kiriye. Li hemberî vê Kurdan ji bo parastina xwe xwe kişandine çiyayên xwe yên asê, bilind û nagihêj. Tenê li van deran karîne hebûna xwe bidin berdewamkirin. Li van deran agirê ku sembola baweriya wane pêxistine. Zerdeşt ji van mekanên îbadetê re atêşgeh gotiye. Di van atêşgehên ku agirê pîroz lê tê dadan û xwedî rolê yeker de hinek sererastkirin lê çêkirine û anîne rewşa dibistanekê. Kesên ku dixwazin baweriya Zerdeştî fêrbibin û bibin pêkhênerê wî li vir dihatin perwerdekirin. Di van perwerdeyan de xwedê jî di nav de her tişt dihat lêpîrsînkirin. Rêbertî di beşeke ji parêznameya xwe ya bi navê Sosyolojiya Azadiyê de wiha dibêje, tê riwayetkirin ku dema ku roj bi hemû rohnîbûna xwe li çiyayên Zagrosan ê ku Zerdeşt pir pêve girêdayî bû de hildibû, dengê dibihîze. Wiha ji wî dengî re diqîre. “Bibêje tu kî yî?” ev şîroveyeke ku wiha rastê xwedê tê û hesab

dipirsin. Ez bi xwe jî di wê baweriyê de me ku rastî hesabpîrkirinekê xweda-qralên Sumerî yên ku bi hezaran salan berê xwe dane azadiya gelên Zagrosê tê.” Li vir gotina baş bihizire, rast biaxive, xweşik bike weke destûra bingeîn hatiye girtin.

Piştî ku êrîş û talana hêzên dagirker û serdest a li ser Kurdistanê dest pê dike, Kurd jî ketine nava têkoşîna parastina hebûna xwe. Tebeqeya jor a Kurdan eslê xwe înkâr kirine û wekî dijminê xwe lê hatine, tebeqeya gel a ku piraniyê pêk tîne jî xwe dane cihên çiyayên bilind û asê, xwe parastine. Elewîtiya xwe di şewazê Êzîdîtiyê de daye berdewamkirin. Bisazîbûnên weke ocax, dergah û tekke berdewam kirine. Di van de bi rêûresma tesewufî ya ku pêş xistine ne tenê zanyariyên olî, zanyariyên qewmî jî dane û ji civakê re dane amadekirin. Di ocax, dergah û tekkeyan de perwerdeyeke pir têr û tijî hatiye dayîn. Di van perwerdeyan de bal hatiye kişandin li ser taybetmendiyên exlaqî yên ferd, xwestine ku ferdên biexlaq bigihînin. Rêgeza, ‘li destê xwe, zimanê xwe, pişta xwe miqate be’ bingeh hatiye girtin. Di rastiya de ev pratîkirina rêgeza “xwe nas bike” ye.

Kurdên ku li hemberî mekanên fermî yên hêzên serdest bi guman nêzîk bûne, dibe

ku herî zêde perwerde li medreseyan hatiye kirin. Medrese tam bûne mekanên perwerde yê. Medreseyên ku di demên destpêkê de tenê wekî navendên perwerdeyên olî bûne, piştî salên 950'î de gelek zanistên din jî girtiye nava xwe û tam bûye komplekseke perwerdeyê. Di van mekanên perwerdeyê yên ku wêjeya bingehîn a zimanê kot bingeh dihat girtin de, gelek hizirînerên Kurd ên mezin ghiştine. Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanê, Mela Goranî, Cegerxwîn û bi dehan rewşenbîrên Kurd li van mekanan ghiştine. Ji ber ku di medreseyên Kurd de rêgeza hînbûna hemû beşên ku dihat dayîn esas dihat girtin û pegaleke weke ku kesan ji ezmûnan derbas bike nîn bû, di medreseyan de ref derbaskirin an jî di refê de mayîn tine ye. Li vir mijara ku li ser tê xebitîn derbarê wê de bûyîna xwe hizreke kûr bingeh tê girtin. Ji ber wê yekê hêza muhakemekirinê dide qezenckirin. Weke ku li cihên din heye, tenê bi jiberkirineke xwerû têr nabe. Her çi qas piştî ku medrese dikevin bin kontrola terîqeta Naqşîbendî de, roleke neyênî listibe jî, di berdewamkirina hebûna xwe de roleke girîng listiye.

Weke encam tişta herî bingehîn a ku civakê bide berdewamkirin, perwerde ye. Çawa em pêwîstiya biyolojîk a mirovan bi xwarin xwarinê pêşwazî dikin, pêwîstiya

manewî jî tenê bi perwerdeyê pêşwazî dikin. Di vê wateyê de perwerde têrkirina ruh û manewiyatê ye. Tevî ku îro ev qasê saziyên perwerdeyê hene, ev qasê mirov perwerdeyê dibînin û mîdeya wan tijî ye jî valabûna manewiyat û birçîbûna ruhê wan ji nêz ve bi vê sîstemê re eleqedar e. Civakeke xwedî agahî, lê bê wijdan û bê ruh tê pêkanîn. Amûra herî bingeîn a avakirina vê jî perwerde ye. Nexwe wê demê rêya avakirina civakeke biwijdan, adil û demokratîk, bi pêşxistina ferasetê perwerdeyê ya bi beşdarbûna her kesî re gengaz e. Çawa ku pîvana demokrasîyê beşdarbûna gel e, pîvana perwerdeya demokratîk jî tevlibûna civakê ye.

PERWERDEYA NETEWEYA DEMOKRATÎK

Bi gelemperî pergala şaristaniyê bi taybet modernîteya kapîtalîst bi rêya sazî û medyayê ve tevahiya civakê dişibîne xwe. Bi van rêyan nasname û çandên cuda di nava çanda ziman û dewletên serdest de têne helandin, ferd jî ji mirovên bûne xwediye nasname û kesayet jî têne dûrxistin. Dibin parçeyek ji mekîneya şaristaniya her roj mezin dibe. Êdî mirov ne bi nasnameya xwe ya ferdî û çandî, bi rewşa nasnameya amûrên endezyar, parêzer, teknîsyen, gerînende û profesorên duvikên çerxa pergale ve derdikevin pêş. Bi vî rengî jî kirdeyên (ozne) xwedî nasname û kesayet têne dûrxistin, weke amûr an jî biresera pêdiviyên pergale pêşwazî dikin, têne veguhertin.

Heta ku pergal, bi şaneyên civakê yê bingehîn nelîze, nikare van pêk bîne. Lewma têgeha perwerdeyê û saziyên perwerdeya pergala şaristaniyê, zanist, ol û felsefeyê diguherîne, sedemên hebûnê berovajî bi kar tîne û xwezaya civakî ya exlaqî û polîtîk texrîb dike. Di van guherîn û texrîban de çî qas bi ser bikevin, ew qas jî bi awayekî ewle avabûna xwe didomînin. Bi vî awayî bi perwerdeyê hem ji aliyê hişmendiyê ve hem jî aliyê sazîbûnê ve civakê belav dikin.

Hêmanên şaristaniya demokratîk, hewl daye li hemberî vê pergala perwerdeya bi plan û rêxistinkirî, xwe bi rêbazên perwerdeya berfireh a kevneşop berdewam bike. Hinek sazî hem bi bergeh hem bi kûranî, bi sînor bin jî yên weke agirgeh, ocax, medrese û tekke, li hemberî berfirehkirina pergala perwerdeya şaristaniya sazûmankirî, weke tevdîr hatine pêşxistin, lê ev tam di wateya xwe de nekarîne pêdiviya civakan pêşwazî bikin. Gelek caran ev saziyên bisînor ên şaristaniya demokratîk jî, ji aliyê pergala serdest ve hatine belavkirin. Civaka kevneşop a xeteriya hişmendî û saziyên perwerdeya şaristaniya dewletparêz a di nava exlaq û pergala civakê de hesiyaye, hewl daye hîn zêdetir zarok û ciwanên xwe ji vê hişmendî û saziyan dûr bixe. Ji bo ku zarokên xwe neşînin van dibistanan ol û kevneşop weke hêncet dane nîşandan. Di cewherê xwe de dibistanên pergale xeter dîtin û neşandina zarokên xwe ne şaş e. Li gel vê, zarok bêperwerdehiştin jî şaşîtiya herî mezin e.

Di vê qonaxa ku zarok û ciwan bê perwerde têne hiştin, an jî mehkumê pergala perwerdeya dijberê ferd û civakê têne kirin de, modernîteya demokratîk, li hemberî modernîteya kapîtalîst a ku lûtkeya şaristaniya dewletparêz e, weke alternatîfa şaristaniya demokratîk a biplan, rêxistinkirî

û dagirtî derdikeve holê. Li hember şaristaniya dewletparêz a xwe weke hişmendî û sazîbûna kapîtalîzm, endustirî û dewlet-netewe bi rêxistin dike, modernîteya demokratîk bi alternatîfên weke neteweya demokratîk, endusturiya ekolojîk û konfederalîzma demokratîk derdikeve holê.

Neteweya demokratîk hem hişmendî, hem jî hêmana jiyana civakî ye. Lewma yekser bi diyardeya perwerdeyê ya ku zanebûn û giyana civakê ye ve girêdayî ye. Weke ku neteweya demokratîk a hêmana hişmendî û jiyana civakî ye, wê bi perwerdeyê were avakirin, wê perwerde jî bi hişmendiya neteweya demokratîk ve bigihêje rol û kargerîya xwe ya rast. Ya ku hêmana jiyana civakî ye neteweya demokratîk e, netew û civakê weke diyardeyek pir alî digire dest û azad xwe rêxistin dike, rave û pêkanîna cêwaziyên ziman, ol, mezhep, çand, kom û kesên xwedî raman esas digire. Ev, tê wateya ku her kes û her komên civakê xwe li ser bingehê zimanê dayîkê, çanda cewherî û esasgirtina nîrxên bawerî û exlaqî, perwerdeya xwe rêxistin kirine. Li ser bingehê raman û îdealên xwe her ferd û komên civakî perwerdeya xwe bi rêxistin bike. Meşandina vê jî di çarçoveya vê hêmana civakî de ye.

Hêmana hevsengiyê ya hemû cudahiyên civakî, demokrasî ye. Perwerde jî, qada her tim hilberîn û jîndarkirina van hêmanên hevsengiyê yên civakî ye. Ger her tim civak û demokrasî dikarin, xwe ji nû ve hilberînin, bi demokratîkbûna perwerdeyê ve girêdayî ne. Demokratîkbûna perwerdeyê jî, tê wateya hevsengiya ku bi hebûna civakê re girêdayî ye. Demokrasî, ji teşeyek rêveberiyê wêdetir halê hebûna xwezayî ya civakê ye. Lewma têgeha perwerdeya neteweya demokratîk, bi esasgirtina hebûna xwezayî ya civakê tê avakirin. Jiyan û wate, du hêmanên bingehîn ên hebûna civakî ne. Ji ber vê, divê têgeh û pergala perwerdeya neteweya demokratîk, bi qasî lêgerîna pêşwazîkirina pêdiviyên jiyânî yên civakê ye, ew qas jî ji lêgerînên wateyê re bûne bersiv. Lewma weke îzafe, ferd û civak, ji hişmendî û saziyên desthilatdar û kole rizgar bûn, hedefa têgeha perwerdeya neteweya demokratîk e.

Pergala perwerdeya demokratîk a Kurdistanê, wekheviya cewaziyên ku di bingehê hebûna civakî de cih digirin ku ji bo pêşketina wê jiyânî ye, esas digire. Bê ku têkîlî û nakociyên ferd û komên yekbûna civakê ava dikin, zerarê bidin rêgezên wekheviyê, têgeh û hişmendiya di zemînê demokrtîk de, meşandina wan ava dike. Ji hêla jiyana civakî ve, mijarek ji ya hebûnê ve

jî, rêveberiya cewherî û jiyana hevpar e. Civak, di cewherê xwe de komunal û demokratîk e. Yekdestên sermiyan-desthilatî weke barekî li ser milê civakê ne û hêmana bingehîn a jêdera pirsgirêkên civakî teva ne. Lewma li hemberî desthilatî-sermaye hişmendiya jiyana hevpar û rêveberiya cewherî ya civakê saz dike, ava kirin jî, di nava erkên saziya perwerdeya demokratîk de ne. Jiyan li derdora jinê hunandin, ji rastiya xwezaya civakî tê. Bi xwe re jîrbûna hestiyarî û analîtîk di nava hevsengiyê de yek kirin, demên dirêj ne tenê jin, jiyan nepenî û pîroz kirine. Bi kolekirina jinê re jiyan, kûranî û pîrozbûna xwe di radeyeke girîng de winda kirine. Ji bo jiyan ji nû ve pîrozbûn û wateyên kûr bi dest bixe, divê jîrî, estetîk û hestên dayîktî yên jinê di hişmendiya civakî de, bi bandor bibe. Lewma pergala perwerdeya demokratîk, çawaniya vê hebûna xwezaya civakî, weke hêmana hişmendiya civakî ya bingehîn, bingeh digire.

Xwezaya yekemîn, weke xwezaya duyemîn mercê hebûna mirov û civakê ye. Di bingehê hemû biyanîbûnan de, biyanîbûna ji xwezayê heye. Mirovê ku bi hêrsa sermaye û serweriya mezin bi ser xwezayê de diçe, ne di wê ferqê de ye ku êrîşî hebûna xwe dike. Çi derbaskirina van pirsgirêkên gihane sînoren xeteriyar, çi jî ji bo avakirina mirov û civaka

têkûz bi xwezayê re hevsengiyê de ye, bi hişmendiya civakî re zanebûna ekolojiya civakî, pêş xistin, ji hedefên bingehîn ên perwerdeya demokratîk e. Divê di serî de pergala konfederal a demokratîk, hemû civak û pergalên civakê parastina xwe ya rewa bikin. Ev jî hêmana jiyanî ya xwezaya civakî ye. Divê her civak di serî de ziman, bawerî, axê û tevahiya nirxên xwe yên madî û manewî yên çandî biparêzin û pêş bixin. Lewma pergala perwerdeya demokratîk, bi hemû ferd û yekeyên civakê re avakirina hişmendiya parastina rewa ya rast, ji esasên jiyanê yên civakê, dibîne. Mijara ku ji hêla xwezaya civakî ve jiyanî ye, paradoksa azadiya ferd û civakê ye. Ev rewş di cewherê xwe de ne pirsgirêk e, dînamîkê pêşketina civakî ye. Yek ji wan weke vebijêrk, xwezaya civakî birîndar kiriye. Ji bo ev paradoks di zemînê demokratîk de rê ji pêşketinan re veke, divê hemû derfetên pêşketina fikir, giyan û beden, werin dayîn da ku ferd bikaribe xwe ava bike, ji bo vê jî avakirina hişmendiya civakî di nava hedefên pergala perwerdeya demokratîk ên herî girîng de ye.

Di nava girêdana diyalektîka xwezaya mirov û civakî de, ji jiyanê qut nake, taybetmendiya duyemîn a bingehîn, lêgerîna wê, ya wateyê ye. Hewldana têgihîştina xwe, civak, xweza û gerdûnê, rastiya bingeh a

hemû zanînan e. Tevî hemû hewldanên zanînê, radeya ku mirov di vê mijarê de bi dest xistiye, gelekî bi sînor e. Pergala şaristanî û pergala kapîtalîst, jiyanê ji wateyê qut dike, dixê nava sînorên made û meta. Bi taybet meylên pozîtîvîst, dikare bê gotin hemû lêgerînên pîroz û wate yên beriya xwe, berovajî kirine û avêtine kêlekê, tiştên ku hezên pere û beden pêş naxin, avêtine heta sînorên tinebûnê weke marîfeteke mezin dîtine. Lewma jiyan bi wate kirin, an jî jiyan bi wateyê re bi yek nirxî dîtin, bi qasî hevsengiya bi xwezaya civakî ye, ew qas jî ji bo çareseriyê pirsgirêkên civakî, avabûneke hişmendiyê, pêwîst e. Lewma pergala perwerdeya demokratîk ji ber van sedemên bingehîn bi qasî nirxdayîna lêgerîna wateyê ye, ew qasî jî ji wê re zemînên pêkhatina azad pêşkêş dike.

Ev xalên me bi xetên giştî ve danîne holê, di cewherê xwe de çawaniyên exlaqî û polîtîk ên civakê ne. Ji bo pêkanîna wê jî bi pergalên perwerdeya demokratîk ve pêwîstî bi avakirina hişmendî û saziyên wê heye. Divê avakirina neteweya demokratîk bi endezyariya civakî re neyê tevlîhevkirin, ev cudatiya pergala perwerdeya demokratîk e. Berovajî endezyariya civakî, avakirina civaka demokratîk, bi ziravî û hişyariya hunermendekî, îrfana zanyariya alimî û

dilrehmiya dayîkê tê kirin. Di navbera huner
û hunermend, îrfan û alim, dayîk û zarok de,
avakirinên yek alî tine ne; her dem
bandorbûnek li beramberî hev heye. Ji bo
avakirina civakî xala herî girîng, ev avabûn bi
qasî hunerî, alimane û dayîkî ye, ew qas jî bi
xwezaya civakî re di nava hevsengiyê de bi
rêgezî pêk anîne.

NÊRÎNÊN LI SER PERWERDEYÊ

➤ Di perwerdeyê de zanebûyîn, hîndekarî, têgihîştin, bikaranîn û danîna bikaranînê di nava temambûyînekê de ne û hev û du tamam dikin. Li ser vî esasê perwerdeyî; divê ji her mirovên tevlî dibin re kêrhatî be, hîs û hişmendiyên mirovan pêş bixe, da ku mirov xwe bi azadî îfade bike, kesayet û ferasetê bi dest bixe û ji bo ku zanebûnên xwe parve bike, qadên wekhev û komînal pêşkêş dike.

➤ Perwerdeyeke hêja û hindekariyeke binirx, çalakiyên însakirina civakîbûyîna demokratîk û jiyana azad e. Civak bi perwerdeyê, ji perçebûyîn, hiyerarşî, zayendperestî, olperestî, netewperestî, talankirina xwezayê û ji her cure amûrbûyîne, xelas dibe.

➤ Pergala perwerdeyê, kesên azad û xweser ava dike. Li hemberî taybetiyên zayendperest, desthilatdar, berxwarkar, eznavend, ezezî, berjewendîparêz û madiyatkar ên ku çavkaniya xwe ji modernîteya kapîtalîst digirin, pêwîst e ku bi rêya perwerdeyê, têkoşîn bê kirin. Li ser van esasan perwerdekar, li hemberî her cure bişavtin û dagirkeriyê di çarçoveya xwebûniyê de têdikoşe.

➤ Zanîn bi hemû ziraviyên xwe ve nayên pêşkeskirin. Giranî dide rê û rêbazên ku xwe

digîhîne zanînê. Zanînên biberhem, ne rêbaza jiberkirin û dayîna jiberkirinê ne, zanîn rêbaza lêkolînkirin, vekolînkirin, têgîhîştin û fêmkirinê esas digire.

➤ Mafên civakan ên perwerdeyê weke mafekî xwezayî û xweser e, bikaranîn û pêkanîna mafê perwerdeyê ku ji aliyê civakê ve pêk were, perwerde dê ew çax hêjatir, watedartir û dewlemendtir bibe.

➤ Di mijara însakirin û faliyeta pergala perwerdeyê de merc û hemû endamên civakê berpirsiyar in. Di vê çarçoveyê de her kes, di pêkanîn û amadekirina şahî û bernameyan de bi mercên ku ji aliyê civakê ve hatine pejirandin, dikarin tevî bibin. Mirovên kal û xwedî tecrube, kesên ku ji aliyê jiyanê ve dewlemend in, bi tevîkirina sûda civakî ve kesên ku ji mijarekî rêzê ve danehev û zaneyên têrker bi wan re heyî, mirovên zanist, hozanên gel, kesên girêdayî pişeyên cuda û gelek mirovên din, ji pergala perwerdeyê re bi awayekî aktif dikarin sûdê bidin. Perwerde, bi vê rêyê ve hem ji pêwîstiyên civakî re baştir bibin bersiv, hem jî di rastiya wateyê de wê bibe hebûna pêkanîna faliyeta civakê.

➤ Bi hişmendiya ku jiyan bi perwerdeyê ve tê însakirin, faliyeta perwerdeyê, di hemû qadên jiyana civakê û hemû mekanên civakî

de, weke pêşaniya(öncelik) bingeh û destpêk tê dîtîn.

➤ Civak, ji hemû endamên xwe re derfeta perwerdeyê ya ku demokratîk, azadîxwaz, wekhevîxwaz e ku ji aliyê madî ve pêşwazîya wê tune ye, pêşkêş dike. Di pergala perwerdeya neteweya demokratîk de, pêşwazîya madî tune ye. Kes jî, van derfetan li gorî nîrxên civakî bi kar tîne û tevlîbûna jiyana civakî weke maf qezenc dike.

RÊXISTINKIRINA PERWERDEYÊ

A- RÊXISTINKIRINA PERWERDEYA CIVAKÊ

1. Pergala perwerdeyê, ji bo ku civaka polîtîk û exlaqî xwe bidomîne, astengên li pêşiya pêşxistin û xweîfadekirinê ji holê rake, bi awayekî hemû qadên jiyânî yên civakê bigire hundirê xwe rêxistinkirina xwe û bi vî awayî însakirina bi têşeya neteweya demokratîk ve hişmendiya ku însakirinê pêk bîne, ava dike. Kesayetiyê derdixe holê, hewil dide ku bingehe pêkanîna projeyan û rêxistinkirina civakî derbasî jiyane bike, biafirîne.

2. Di perwerdehiya civakî de zanîn, pêşxistin û hilberîna zanîstî, avakirina hişmendî û faliyetên hinkarî-perwerde; bi pêvajoya ku civak xwe ji nû ve însa dike re di nav hev de, di nava temamkirinê de tê pêşxistin û birêvebirin.

3. Paradigma, ji bo jiyana civakê û endamên wê, wê çawa û ji bo çi bê jiyîn re, dibe bersiv. Di rastiya ji nû ve însakirina neteweya demokratîk de civaka demokratîk, neteweya demokratîk, malbatên azad û jiyana azad, wê çawa bîn însakirin, ji aliyê kê û ji ku ve bê destpêkirin û çi bîn çêkirin ve pêwîstiya rê û rêbazan û avakirina saziyên civakî xistina meriyetê û berbelavbûyîne

digire nava xwe. Hinkarî- perwerdeya civakî û saziyên perwerde di vê çarçoveyê de tèn rêxistinkirin.

4. Pergala perwerdeya neteweya demokratîk, weke tevgera civakê rêxistin dibe. Pêşxistina rêxistinkirina ku bi awayekî demokratîk û xweser ve ji perwerdehiya hemû beşên civakê re bibe bersiv û her kes ji van xebatan re bibin endamên çalak.

5. Komun, komikên civak û kesan, bi bingehe demokrasîya radîkal, rasterast û kûr tevli pergala perwerdeyê dike. Civak, însakirina perwerdeyê di bin banê şaneyên rêveberiya cewherî de avakirinê esas digire.

6. Çandên cuda, komikên temenan, beşên civakî, şaxên hilberînê, qadên jiyânî yên civakî, li gorî bi pêşxistina bernameyên perwerdeyê ve ji derfet û xweseriyên xwecîhî re bikaribe bibe bersiv; ji bo aliyên hevparî, merc û pêwîstiyên civakan, herêman û gelan, giraniyê dide bernameyên perwerdehiya bi hev re, berbelavbûyî û giştî. Ev bername û perwerde jî dikevin meriyetê.

7. Ji aliyê hejmarî û mekanê ve ji komuna herî biçûk bigire heya komuna herî mezin, her yekîneyên civakî di nava xwe de, li gorî pêwîstî, derfet û kapasîteyên xwe ve polîtîkayên perwerdeyê, bername û rê û

rêbazên xwe diyar dike, rêxistin dibe, xwe saz dike.

8. Di modernîteya demokratîk de, rêxistinkirina perwerdeya bingeîn pergala akademyan e. Înşakirina akademyên jiyana azad, bi tewereya jinê ve girêdayî ji bo ji nû ve însakirina civakî, Jinelojî û akademyên jinan, di nava komunên gund û di nava komunên heremî de akademyên komunan, di bingehe koopatîfan de, akademyên aborî-ekolojîk û çandiniyê, ji bo ku feraseta siyaseta demokratîk bê pêşxistin, akademyên siyaseta demokratîk, di qada parastina cewherî ya gel de akademyên parastina cewherî, akademyên çand û baweriyên, ji beşên civakê (yên ku weke ciwan û zarokan) re akademyên xweser, ji qadên werzîş, tendirustî, huner re avakirina akademyan.

9. Li gorî ku ji pêwîstiyên civakê re bikaribin bibin bersiv, weke saziyên di bingehe akademyan, yekeyên niştecîh, beşên civakî û qadên jiyani de enstîtu, waqif, komele, malên gel û pirtûkxane bîndamezirandin. Bi vê ve girêdayî, her mal, gund, kuçe û kolan weke mekanên perwerdeyê û akademyan tê destgirtin.

B- AKADEMIYÊN AVAKIRINA JIYANA DEMOKRATÎK Û AZAD

“Ti civak mafê xwe yê hebûnê û ji bo vê erka perwerdekirina ciwanên xwe bi hêzeke din re parve nake û dewir nake. Nexwe wê bikeve rewşa xwe radestî yekdestên serdest kirine û were hesabandin”. (RÊBER APO)

Pergala Modernîteya Demokratîk pêkhatina sîstema xwezaya civakî û hêzên civakî yên roja îro ye. Modernîteya demokratîk taybetmendiyên erênî yên biriqîn û şoreşên entellektuel ên dema şaristaniyê

û entellektuelên dijberên modernîteyê li ser bingehe têgihîştina şoreşên entellektuel û zanistî pêk tîne. Bi rexnekirina zanist, felsefe û hunera modernîteya kapîtalîst ve, modernîteya demokratîk sazîbûna xwe ya pêwîst bi têgînên xwe ava dike. Ji bo avakirina modernîteya demokratîk tevkarîya entellektûel û zanistî pêwîst e, navên van saziyan akademî ne. Pêxirtengiya di cîhana zanîngeh û akademyên pergala kapîtalîst de têne jiyîn, encax dikare bi avakirina zanîngehên azad û saziyên akademyên derbarê her qada civakê ve, werin çareserkerin. Her ku hegemonya bîrdoziya

pergalê were herifandin, wê pêşiya zihniyeta modernîteya demokratîk jî vebe. Lewma sazîbûn jî, şertek ji yê vê şoreşê ye.

Li Ser Vê Bingehê;

1- Li ser bingehê perspektîfa ku Modernîteya Demokratîk bêyî akademiyan pêş nakeve; di hemû qadên civakê (aborî-tekhnîk, ekolojî-çandinî, demokrasî-siyaset, parastin-ewlehî, jin-azadî, çand-nasname, dîrok-ziman, zanist-felsefe, ol-huner hwd...) de li gorî hejmara têr ber bi sazîbûnan ve diçe.

2- Akademî navendên mejiyê civakê, qadên hilberîna zanîna entellektuel in.

3- Ji ber ku ji her demê zêdetir di pêvajoya modernîteya kapîtalîst de mejiyên mirovan tîr asîmîlekirin, ji her demê zêdetir pêwîstî bi akademiyan heye.

4- Akademî bi senteza mabeta mirovên alim, dibistanên filozofan û akademiyan mirovên zanistî ava dike û di van mekanan de pîrsgirêkên mirovahiyê çareser dike.

5- Akademîbûn xwe dispêre kevneşopîya zanyariya Rojhilata Navîn, derketina resen esas digire û ji her cure qalib û teqlîdan dûr disekine.

6- Akademî sazîbûnek xweser û demokratîk e. Bername û qadroyên xwe bi xwe ava dike. Xwendevanî û mamostetiya bidilxwazî bingeh digire. Navendên mejî yê her kesê xwedî îddîa û armanc ku bixwazin beşdar bibine.

7- Mirovên kamil ên yekîtiya fikir-zikir-çalakî esas digire ava dike û xwe digihîne pîvanên etîk û estetîk. Bi nûnertiya yekbûna teorî-pratîk, gotin-çalakî, hest-raman û jiyane yek dike, li ser bingehê şoreşa hişmendî jiyane ji nû ve ava dike.

8- Ji bo careke din zanist û zanebûn bibe ya civakê, were ronîkirin, rêxistinkirin û pêşxistina ezmûn, zanebûn, zanist û danehevên civakê yê xwe dispêrin hezarên salan û berhemên jinê ne vebe, bi erka xwe ya bingehîn radibe.

9- Hemû şaxên zanistê bi têgeha zanista civakî ve bi şewazeke yekbûn û hev û du temamkirinê ji nû ve sererast dike. Dema ku derbarê her qadeke jiyana civakê de zanist û hişmendiyên xweser pêş dixê, di nava yekbûnê de tevdigere.

10- Akademî di navbera xwe de têkîliyên li ser bingehê demokratîk-konfederal pêş dixin û bi berfirehkirina akademiyan ve sazûna

Konfederasyona Çand û Akademiyên Cîhanê hedef dikin.

C- SÎSTEMA DIBISTANÊN DEMOKRATÎK

1- Pergala dibistanên neteweya demokratîk, li ser bingehê paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û azadiya jinê ava kirin û berdewamkirina neteweya demokratîk armanc dike.

2- Xwendevan ji zihniyeta cinsiyetparêz, desthilatdar û dijî ekolojî û jiyana ku bi vê zihniyetê hatiye meyandin dûr dixê, kesayetek nirxên exlaqî û polîtîk ên neteweya demokratîk diparêze, bi hêz dike û hewil dide azad bike.

3- Dibistan, jiyana û perwerdeya hevpar ya komî bingeh digire, piştgirî û yekîtiyê ava dike, ji cihêrengî û curebûnan re rêz digire.

4- Di bingehê pergala perwerdehiyê de ne jiberkirin, hînbûna pêkaniner esas e. Ev rêbaz lêpîrsînê pêş dixê, lêgerînê xurt dike, dijî dogmatîzmê ye, baweriya mirov a bi xwe derdixê holê.

5- Perwerde li gorî bendewariyên kesî, derfetên derxistina holê ya kêrhate û

kerekter pêş dixê û derfetê şêwegirtina wê pêk tîne.

6- Di dibistanên sîstemên neteweya demokratîk de xwendevan di mekanîzmaya biryaran de rasterast cihê xwe digire.

7- Komên civakî yên pêkhatayên neteweya demokratîk, li gorî daxwazên xwe dikarin dibistanên xwe vekin.

8- Dibistan li gorî taybetmendiyên herêman, bi berçavgirtina rêgezên ekolojîk û li derveyî mîmariya hiyerarşik tînin avakirin.

9- Di pergala dibistanan de derûniya zarokan esas tînin girtin. Binesaziya dibistanan ji bo ji her aliyê ve bersivê bidin xwendekar, mamoste û pergala perwerdehiyê bi awayekî tîrker tînin avakirin.

NÊRÎNÊN LI SER PERWERDEYA PÊŞDIBISTANÊ

Divê di perwerdeya pêşdibistanê de;

➤ Di jiyana zarokan ya rojane de, rewşên ku derdikevin holê, zarok lêkolîn û lêpîrsînan bike, afirîneriya xwe pêş ve bibe, ji bo jiyanê komunal parvekirin û piştgiriya esas bigire, parastin, pejirandin û watedarkirina xweza û ekolojîya pêk bîne, pejirandina zayendparêziya û demokrasîya di jiyana xwe de bingeh bigire.

➤ Di warê gihandina zarokan ya civakî û hestiyarî, zanînî, zimanî, psîkomotorî de pêşvebirinê erênî bingeh bîn girtin.

➤ Ji bo amadehiya dibistana seretayî, zarok bigihêjin asteke bilind.

➤ Ji bo civakîbûyîna şert û mercên erênî derkevin pêş.

➤ Zarok hînê çanda xwe bibin û di heman demê de bi çandên din re têkildar bibin.

➤ Pêşvebirina zimanê dayîkê esas bîn girtin.

DI PÊVAJOYA PERWERDEYÊ DE RÊGEZÊN PERWERDEYA PÊŞDIBISTANÊ

Dibistan jîyan û perwerdeya hevpar ya komî bingeh digire, piştgirî û yekîtiyê ava dike, ji cihêrengî û curebûnan re rêz digire. Ev rêbaz lêpîrsînê pêş dixê, lêgerînê xurt dike, dijî dogmatîzmê ye, xwebaweriyê derdixê holê. Di vê bingehê de rêgezên perwerdeya pêşdibistanê wiha ne:

✓ Komînalî û Demokratîkbûyîn

Di xwezaya jiyana zarokan de hevparî esas e. Di warê biryardayînan de, di warê çalakîyan de, di warê kar û baran de hevparî û beşdariya zarokan esas tê girtin. Di dema xwarin û vexwarinê de parvekirin esas tê girtin û rûniştina xwarinê bi awayekî komî pêk bê da ku zarok hev û du bibînin, bi hev re xwarinên xwe parve bikin, amadehiya xwarinê, paqijî û rêkûpêkirina derdoran bi hev re bê kirin. Her wekî din di pêvajoya perwerdehiyê de nêrînên zarokan bingeh tên girtin. Di Bingehê wekheviyê de, fikir û rêmanên zarokan tevî plansaziya perwerdehiyê dibin. Di Bingehê nîrxên ehlaqî de pêşgirtina dexesiyê-hesûdiyê pêwîst e. Ji aliyê fikir û rêmanan de pêşvebirina afirîneriyê, pêşvebirina hilberînê û pêşvebirina parvekirinê girîng e. Zarok wekî kes û parçeyeke herî esas a civakê tê dîtin û

di her şert û mercan de fikirên zarok tîn girtin. Nêzîkbûyîna hestên zarokan girîng e. Di çîrokvegotinê de, di gerên li derdor û cihên taybet de, di çalakîyên drama, muzîk û fen û xwezayê de hest, nêrîn, beşdarbûyîn û fikirên zarokan bîngê tîn girtin.

✓ Parastina Xwezayê

Civak parçeyê xwezayê ye. Têkiliya civak û xwezayê xala herî sereke ye. Hişmendiya wate û rastiya xwezayê bi zarokan re bi awayekî zelal tê parvekirin. Danûstandina di navbera xweza û mirovahiyê de, bi zarokan re tê ravekirin. Ji bo berdewamiya jiyanê girîngiya xwezayê esas tê girtin û li gorî vê hişmendiya tê ravekirin. Amûrên jiyanî (nan, av, xwarin, hwd.) ji xwezayê tîn girtin. Girîngiya avê, daristan, ax û ajalan bi zarokan re tê parvekirin. Taybetmendiya di xwezayê de ne, li gorî hişmendiya zarokan tîn ravekirin, taybetiyên giyanewerên di xwezayê de dijîn (ajalên kovî, ajalên kedîkirî, nebat û hwd.) ji bo ku zarok bipejirînin û nas bikin, di plansaziya perwerdeyê de tîn bicihkirin. Piştî watedarkirina xwezayê, xwedîlêderketina xwezayê di pêvajoya perwerdeyê de tîn nirxandin û tevî plansaziya perwerdeyê dibin. Di pêvajoya perwerdeyê de, di polan de û li cihên derveyî

dibistanê (cihên taybet ku zarok lê bigerin wekî daristan, park, bexçeyên ajalan û hwd.) de ji bo pênasekirin û watedarkirina xwezayê çalaki tên lidarxistin.

✓ Pejirandin û Parastina Ekolojîyê

Divê zarok xwe parçeyek ji xweza û ekolojîyê bibîne. Di rastiya “civak parçeyeke xwezayê ye” de rola zarok bê ravekirin. Wateya xwezayê divê bi awayekî zelal bi zarokan re bê parvekirin. Di kesayetîya zarokan de mirovahî ne xwediyê xwezayê ye, her du hevdu tekûz dikin. Ji xwezayê sûdwegirtin girîng e. Pejirandina xwezayê-ekolojîyê bi bûyerên xwezayê ve girêdayî ye, zindîbûyîn û pergala xwezayê bi mînakên berbiçav tên danasîn. Nirxên amûrên xwezayî weke av, dar, şînahî, ajal, ronahî, tarî, zindiyên di xwezayê de dijîn(nebat, ajal û hwd.),çandiniya xwezayî û çandiniya bidestan tên pênasekirin (di vir de li qad û cihên taybet weke kargehên destan, zevî û mêrg, malên rojê, dam û dezgehên avê, bexçeyên ajalan û hwd. ger bên kirin.)

Ji bo berdewamiya zindîbûyîna xwezayê watedarî, rêzdarî, hilberîn û parastin esas e. Divê li hemberî nêzîkatiyên xwezayê weke berxwarin, qirêjî, pûçkirin, erzandîtin, nêzîkatiyên binirx û erênî

derkevin pêş. Têkiliya xweza û jiyane tê ravekirin, xwedîlêderketina xwezayê di heman demê de xwedîlêderketina jiyana civakî ye. Bi van rêyan watedarbûyîna civaka xwezayî derdikeve pêş.

✓ Afirînêrî

Afirînêrî tişteke hem hestiyarî û hem jî fikirî ye. Afirînêrî ji nişka ve dernakeve, ji bo pêkanîna afirînêriyê wêrekîkirin û rênîşandan pêwist e, wî çaxî afirînêrî bi serê xwe dibe pêvajoyek. Afirînêrî, tiştê nû, guherbar, xweser û awarte ye, ji rê û rêbazan dûrtir e. Kesên afirînêr ji hîndekariyê re amade ne, xwebawer û xweser in, lêkolîn û lêpîrsînan dikin, biwêrek û çalak in, ji bo fikirên nû bi xwestek in. Ji bo ku zarok, pîrsgirêkan çareser bike, ceribandî, lêkolîn û lêpîrsînan bike, xwe nas bike, xeyalên xwe firehtir bike, tiştên nû derxe holê û di warê têkiliyên civakî de xwe pêş bixe afirînêrî pêwist e. Di pêvajoya perwerdeyê de, ji bo pêşvebirina afirînêriyê çalakiyên weke wênexêzî, dramatîzekirin, çîrokvegotin û tevgerên afirînêr ku bînan kirin, afirînêriya zarokan dê derkeve asteke bilind. Di vir de helwestên dê, bav û mamosteyan girîng in. Tiştên ku zarok derdixê holê dibe ku ji hêla mezinan ve biçûk, bê wate yan jî bê kêr were dîtin, lê ev helwesta nerast, divê li gorî

taybetî û nêrînên zarokan bê nirxandin. Ji bo pêşketina afirînêriyê divê şert û merc bên bicihkirin. Dîwarên polan xwezayî bibin an jî bi rengên vekirî bên boyaxkirin, amûrên ku zarok bi kar tînin balkêş û kêrhatî bin, ronahî, germayî û serma di nav hev kêşeyekê de bibe û cihekî xwezayî weke bexçeyên dar û lîstikan divê hebin.

✓ Parvekirin

Parvekirin di encama civakîbûyîna de derdikeve holê. Di pêvajoya perwerdeya pêşdibistanê de zarok bi civakîbûyîna ve parvekirinê jî nas û watedar dike. Ji ber ku parvekirin bi civakîbûyîna zarokan ve girêdayî ye, di warê parvekirinê de zarok bi zorê tu tiştekî xwe parve nake. Ji ber ku zarok tiştên xwe(leyîstok, cil û berg û hwd.) parve nake, divê malbat û mamoste li hemberî vê rewşê zarokan neêşînin, zordariyê li ser wan nekin. Di jiyana zarok de, dema ku zarok xwedî biryar be, yan jî ji bo biryardayîna derfetên zarok hebin û xwedîhilbijartinekê be, zarok dê wî çaxî wateya parvekirinê fêm bike. Di çalakiyan de bi zimanekî erênî bi zarokan re axaftin tê kirin. Ji bo wênexêziyê mamoste dikare ji zarokê bipirse: du boyaxên te hene, tu dixwazî kîjanî bidî hevalê/a xwe? Di vir de zarok xwedî amûrekê/î ye û di warê biryardayîna de dikare tiştekî bike. Zimanekî

bi vî awayî ji bo zarok bifikire û parve bike girîng e. Her wekî di çalakiyên din de, parvekirina bi xwesteka zarokan û bi destên zarokan bê kirin girîng e. Di polê de yan jî di çalakiyekê de şêraniyek, xelatek an jî xwarin û vexwarinek ku bê belavkirin, her carekê zarokek bi hevalên xwe re yek û yek parve bike, dê di zarok de ji hêla hişmendiya parvekirinê ve pêşketin derkevin holê. Di çalakiyên dramayan de, çîrokvegotinan de, lîstikan de bi mijara parvekirinê tîndarxistin.

✓ Zayendparêzî

Hebûna zayenda mirovan di xwezayê de aşkere ye. Taybetiyên hebûniya herdu zayendan(jin-mêr) bi nirxên xwezayî tîndarvekirin. Li hemberî nêzikatiya pergala kapîtalîst û modernîst ku di jin û mêr de cudahi û kêrhatiyên mezîn derdixin, divê jin û

mêrtî weke xwezayî bê dîtin, her du jî weke nirxên xwezayî ne û bi civakê ve girêdayî ne. Di pêvajoya perwerdeyî û di jiyana civakî de, cudahiyan ku li gorî zayendê hatine diyarkirin, ji holê tîndarvekirin. Rol û mîsyonên li ser jin û mêran hatine belavkirin, divê ji holê bên rakirin. Di lîstikekê de, jin û mêr jî dikarin bi heman pêlîstokê bilîzin. Di jiyana rojane de jin û mêr jî dikarin heman cil

û bergan li xwe bikin, heman rengan
 bipejirînin. Rengê penbe ne rengê zayenda
 jin e, her du jî dikarin bi kar bînin.
 Taybetiyên weke zayendê tên dîtin, di
 navbera zayendan de zêdetir cudahiyê
 derdixe holê. Di bedena mirovan de her der
 weke çav, mil, birû, zik û hwd. taybet in. Divê
 di perwerdehiyê de rê û rêbaz bi van esasan
 bimeşin, hevparî û wekhevî bingeş bê girtin.
 Di lîstikan de, dramayan de û her wekî
 çalakiyên din de, dîrektîf bi baldarî bîn
 sepandin. Hemû çalakî di bingeşê wekheviyê
 de bîn lidarxistin. Bi taybetî di lîstik û
 dramatîzeyan de parvekirina rolan girîng e.
 Roleke/î hêzdar jin jî û mêr jî dikare wergire
 û bilîze. Di plansazî û materyalan de,
 aşkerekirina teşeyên zayendan divê weke
 “jin bêhêz û zirav e, mêr jî bihêz û qalind e”
 neyê nepixandin, cudahiyên di bedena jin û
 mêran de bi awayekî zelal bê dayîn û
 xwezaya wê bê fêmkirin. Di pêvajoya
 perwerdeyî û jiyanê de tu zayend ji hev
 kêmtir an jî zêdetir nîn in, li ser vê esasê di
 kar û baran de, di reng, pîşe û pêlîstokan de,
 ev rêbaz naguhere.

✓ Ziman

Gihaştina zimên bi gihaştina zanînê,
 fîzîkî, hestiyarî û civakî ve girêdayî ye. Di
 pêşketina zimên de xala herî sereke

civakîbûyîn e. Çand, kenveşopî, erdnîgarî û pêwindiyên civakê, bandorê li ser ziman dikin. Zarok piştî jidayîkbûna xwe, di nav malbatê de bi rêya teqlît û modelgirtinê ve dest bi hînbûna zimên dike. Civakîbûyîna zarok di malbatê de dest pê dike û didome. Beriya perwerdeyê, Bingehê zarok ya zimên xurtir e, heta 3-4 saliya xwe zimanê xwe weke pêkanîna hevoksaziyê zêdetir pêş ve dixê. Piştî van temenan bi perwerdeya dibistanê, zarok zêdetir kesan nas dike, civakîbûyîn pêş dikeve, peyv zêdetir dibin û hevoksazî xurtir dibe. Zarok heta ku were perwerdeya pêşdibistanê, li mal dijî û bi zimanê dayîkê dipeyîve. Perwerdeya pêşdibistanê ji bo pêşketina zimanê dayîkê girîng e û divê zarok bi zimanê dayîkê perwerde bibe, di taxekê de, di gundekî de, di komekê de li gorî piraniya hejmara zarokan, kîjan ziman tê axaftin divê perwerde jî bi wî zimanî bê kirin û plansazî bi vê esasê bîn amadekirin. Ji bo ku zarok rê û rêbazên zimên, bilêvkirina peyv û têgehên û sazkirina hevokan pêk bîne, pêwîst e ku mamoste û xebatkarên dibistanan bi awayekî zelal û rêk û pêk bipeyîvin. Bi rê ya çîrok, helbest, mamik, zûgotinok, stran, lîstik, pêkenok, qewlêrk û dramatîzeyan ziman dê zêdetir pêş bixin û ji bo amadehiya dibistana seretayî çalakiyên bi vî rengî bîn lidarxistin. Ji bo ku

zarok bi zimanê xwe bipeyîvin bi teknîk û materyalên cur bi cur çalaki tên lidarxistin. Di Bingehê çalakbûyîna zarokan de ji bo ku zarok bi axivîn derfet tên dayîn. Bi vê hişmendiyê, zarok dê xwe azadî îfade bike, rêk û pêk biaxive, bi kesan re têkiliyan dayne, peyvên di zimanê xwe de zêdetir bike, di nav têkiliyan de “çima û çawa” yê û pêkhatayên baldariyê û têgihîştinê pêş bixe.

✓ Civakîbûn

Ji bo civakîbûyîna zarokan, divê çalakiyên civakî bîn lidarxistin. Divê zarok xwe, derdor, xwezayê û civakê nas bike û di navbera van de têkiliyan dayne. Divê perwerdehî weke mafekî bê kirin û zarok li gorî nirxên xwe, li gorî kevneşopiyên xwe û li gorî xwezaya xwe ya civakî bê perwerdekirin. Zarok weke kesekî/ê xweser û resen bê dîtin û ji aliyê çandê ve bi rastiya civakê bikeve pêvajoya civakîbûyînê. Divê zarok bi civakê re bijî. Di bingehê hevkarîyê de têkiliyên xwezayî, xweser û civakî bîn lidarxistin. Di çalakiyan de ji bo ku zarok xwe bîne ziman, derfet tên dayîn. Di rojên taybet û pîroz (Newroz, cejn, roja zimanê dayîkê û hwd.) de çalakiyên ku zêdetir zarok xwe tevî bikin tên lidarxistin. Di bingehê gerên li qadan de, li sazî, komele û kargehan ji aliyê zarokan ve serlêdan pêk tên. Çalakiyên di

polan de (çîrokvegotin, dramatîzekirin, lîstik, muzîk û hwd.) tên lidarxistin û ji bo ku zarok têtikiliyan di navbera çalakî û jiyana rojane de deyne derfet tên dayîn. Çalakiyên wekî xwepêşandanê ku li dijî, hişmendî, hestiyarî û biryardayîn û bê îradeya zarokan li gelek deveran di dawiya dibistanan de tên lidarxistin, li ser derûniya zarokan bandorên neyînî dikin. Ji ber vê sedemê çalakiyên bi vî rengî(xwepêşandan, şano û hwd.) divê neyên lidarxistin.

✓ Çand

Çand, ji zanîn, bawerî, agahî, huner, ehlaqên kesan û ji şewaza jiyane ya di encama civakîbûyîna mirovan de derdikeve holê, çêdibe. Pêşketin û parastina çandê bi têtikiliyên xweza û civakê ve girêdayî ye. Taybetmendiya her civakê (tax, gund, bajar, ol, cîsn) di xwezaya xwe de xwedî nirxekî ye. Pejirandin û parastina wan pêwîst e. Di pêşketin û parastina çandê de rola herî sereke, ziman dilîze. Bi ziman ve girêdayî huner, dîrok, kevneşopî xwedî nirx û girîng in. Di pêvajoyê plansaziya perwerdeyê de destgirtina nirxên çandî, di bingehê taybetmendiya civakî de pêk tînin. Her wiha di çalakiyan(dramatîzekirin, çîrokvegotin, gerên li qadan, strangotin, reqisandin û hwd.) de taybetmendiya zarokan li ber çavan tînin

girtin. Taybetmendiyên çandî her çi qas ji hev cudatir bin jî, weke xwezayî tîn dîtî û ev rewş weke dewlemendî tî dîtî. Di pêvajoya perwerdeyê de ji bo ku zarok çanda xwe, dîroka xwe binase di hemû çalakiyan de dîrektîf bi baldarî tî sepandin. Di roj û hefteyên taybet û pîroz de hemû çalakî, li gorî taybetmendiyên civakê tî lidarxistin.

WARÊ PÊŞVEÇÛYÎNÊ YÊN ZAROKAN

Pêşveçûyîna zarokan ne tenê li ser hêlekê an jî qadekê ye, pêşveçûyîn di heman demê de bi pêşketinên hemû qadan ve pêk tê. Hemû qadên pêşveçûyînê (civakî û hestiyarî, zanînî, zimanî, bedenî) bi hev re têkildar in û li ser hev bandorê dikin. Pêşveçûyîn ji zikê dayîkê ve dest pê dike û di tevahiya jiyanê de xwe didomîne. Zarok her çi qas di heman hêlê de pêş ve biçin jî, cudahiyên wan derdikevin holê. Zarok bi têkilî û hevbandoriyan pêşveçûyîna xwe pêk tîne.

✓ Pêşveçûyîna Zarokan a Bedenî

Pêşveçûyîna zarokan ya bedenî, bi bilindbûyîna bejn û kîlogirtina zarokan zelal dibe. Her wiha bi tevgerên zarokan jî aşkere dibe. Pêşveçûyîna zarokan di serî de bi taybetiyên malbatî(genetîk) û xwedîbûna wan a derdoran ve girêdayî ye. Zarok çi qas baş bê xwedîkirin, dê ew qas pêş bikeve. Ji bo ku zarok ji hêla bedenî ve pêş bikeve, şert û mercên xwedîbûnî ên erênî girîng in. Her wiha ji bo ku zarok tevbigere da ku masûlkeyên wan pêşkevin, hebûna hawirdoreke guncav girîng e. Ji bo zarok bi hêla bedenî ve pêş bikeve, divê derfet bîndayî ku zarok bikaribe biçê park, daristan û lîstikan bileyze. Divê astengî neyê kirin ku zarok xwe hilavêje, hilkutîne, hilkişe û bazde.

Ji bo ku zarok tilî û çepilên xwe baş bi kar bîne, divê amûr(meqes, pênûs, kaxiz, boyax, hevîrê lîstikan û hwd.) bên dayîn, bi vê rêyê zarok dê him bikaribe bi kar bîne û him jî pêşveçûyîna masûlkeyên biçûk pêş bixe. Divê zarok bi serê xwe, sola xwe, cil û bergên xwe bi xwe li xwe bike, xwarina xwe bi xwe bixwe, ji bo ku zarok bikaribe van pêk bîne, derfet tên dayîn.

✓ Pêşveçûyîna Zarokan a Zanîni

Pêşveçûyîna zanîni ji bo tiştên ku zarok dizane, yên ku hîn dibe û yên ku difikire bîne ziman girîng e. Ji bo ku zarok ji hêla zanîni ve pêş bikeve çend xalên sereke ev in: feraset, bibîranîn, pêşvebirina ramanan, çareserkirina pirsgerêkan û pêşveçûyîna ziman.

Di hêla pêşveçûyîna ferasetê de, divê zarok bi hev re təkiliyan deynin, tiştên di jiyana rojane de dibin, divê li gorî derfetan, zarok bi çavên xwe bibîne û bijî. Weke mînak, zanîna teşeya sêvekê ne bes e, divê dara sêvan jî bibîne.

Di hêla pêşveçûyîna bibîranînê de, divê zarok karibe tiştên(bûyer, kelecane, şahî, xwestek û hwd.) ku jiyayî be, bîne zimên, çîrok û stranek guhdar kiribe, filmek temaşe

kiribe, lîstikek leyîstibe, di vê hêlê de derfet tîn dayîn ku zarok vebêje.

Di hêla pêşveçûyîna ramanan de, divê zarok bikaribe di navbera ramanan de tîkiliyan deyne û ramanan zêdetir bi hev ve girê bide. Zarok dikarin biçin cihên danûstandinê, malên gel, şano, şahî, şevbêrk û mala dengbêjan, di jiyana xwe de tiştên guherbar bibînin û binasin. Zarok karibe fikir û ramanên xwe bi rêya wêne, stran, çîrok, drama û lîstikan bîne ziman. Ji bo watedarkirin û naskirinê bi zarokan re ravekirina amûran, girîng e. Di derbarê van de derfet bîn dayîn, dê pêşketinên zanînî derkevin holê.

Di hêla pêşveçûyîna zimên de, bi zarokan re hevpeyvîn girîng e, di vir de zarok weke kesekê/î tê dîtin û fikir û ramanên wê/î girîng in, di civatan de, di koman de, di çalakiyan de, divê zarok karibe xwe bîne zimên. Divê zarok karibe pirsan bipirse û bersivên erênî û rast hilgire. Ji zarokan re pirtûkxwendin, çîrokvegotin, strangotin girîng in. Di van rewşan de derfet bîn dayîn.

Di hêla çareserkirina pirsgirêkan de, ku pirsgirêk derkevin holê, zarok karibe bi serê xwe çareser bike, bifikire û biafirîne.

Çareserkirina pirsgirêkan li ser zarokan nayê ferzkirin, an jî zarok nikaribe pirsgirêkan çareser bike, li hemberî vê rewşê hêrsbûyîn xeterî ye. Di pêvajoya çareserkirina pirsgirêkan de alîkarî û piştgirî dibe ku hewce bike, lê divê tenê derfet bên dayîn ku zarok bi serê xwe çareser bike û bigihêje encamê.

✓ Pêşveçûyîna Zarokan ya Civakî

Divê zarok xwe, derdor û civakê nas bike û di navbera wan de têkiliyan deyne. Divê zarok, çimabûyîna rêzikên di civakê de cî girtine hîn bibe. Ji bo ku zarok xwe nas bike, divê li hemberî zarok nêzîkatiyeke erênî hebe. Hişyariyên neyînî û sûcdarî zarokan ji civakê û ji xwe dûr dixin. Di hêla tevgerên erênî de ji bo pêşketina zarokan piştgirî û teşwîqkirin girîng e. Tiştên ku zarok bixwaze bike yan jî xwe biceribîne, divê bi çavdêriyan derfet bên dayîn. Divê kar û bar li gorî taybetmendiyan zarokan û sivik bin.

Ji bo ku zarok hevaltîyan pêk bîne û di encamê de parvekirin û piştgirî derkeve holê, derfet tîn dayîn. Bi vî esasî ji hêla zarokan ve fêmkirina rêzdarî û hezkerinê, girîng e. Ji bo ku zarok rêzikên civakî û rojane watedar bike, çimabûyîna wan hîn bibe û pê binase, rêzik bi awayekî zelal, aşkere tîn danasîn û

ravekirin, çimabûyîna rêzikan esas tê girtin. Di vê hêlê de zordarî û sûcdarî xeterî ye. Di pêvajoya perwerdeyê de bi rêya çalakiyan (çîrokvegotin, dramâtîzekirin, lîstik, strangotin) rêzik tên pênasekirin.

✓ Pêşveçûyîna Zarokan a Hestiyarî

Bingehê pêşveçûyîna hestiyarî bi çar(şahî, hêrs, tirs, kerb) hestan dest pê dike. Gelek fikir û raman bi van hestan ji dayîkbûyînê ve dest pê dike û di her kesî/ê de xwe nişan dide. Ji bo pêşveçûyîna hestiyarî xala herî sereke bawerî ye. Zarok ji dayîkbûyîna xwe ve agahiyên rast û hevkerî bigire di zarok de dê bingehê baweriyê çêbe. Têkiliyên zarokan ên bi derdoran re di bingehê hemfêmkirinê de girîng in. Dema ku zarok fikir û ramanên xwe tîne ziman, divê zarok bê guhdarkirin, nêzîkatiyên weke qerfokî, tiranekerî û sûcdarî baweriyên zarokan dişkînin û dibin sedema xwekêmdîtîna ya zarokan. Li hemberî vê rewşê baldarî girîng e. Di encama tevgerê nebaş de li dijî hêrsbûyîna, ravekirina sedemên tevgerê girîng e. Di navbera du zarokan de pevçûnek derketibe, dewsa sûcdarkirinê li ser encama pevçûnê axaftin, dê di hişê zarokan de zelaliyan derxîne holê.

PÊVAJOYA PERWERDEYA PÊŞDIBISTANÊ

Dibistan perçeyeke jiyana azad ya civakî û çandî ye. Her zarokek weke kesek tê dîtîn û pêşketina civakîbûyînê û jiyana azad bi vî esasî pêk tê.

Jiyana azad bi mirovên azad pêkan e. Ji bo ku mirov azadiya xwe pêk bîne, divê xweser bê dîtîn û bi vî awayî tevbigere, bi zordariyên civakî(olî, dewlet û aborî) ve rû bi rû nemine. Zordariyên civakî çî qas ji pêvajoya perwerdeyê dûr bikevin, perwerde dê ew qas xweser bibe û xwendekar dê ew qas azad bibin. Di pêvajoya perwerdeya xweser de, têkiliya bi jiyana rastî re girîng e. Zarok xwe çî qas di jiyana rastî de bibîne, têkilî, bûyer û hebûniyan fêhm bike, dê ew qas nêzî azadiyê bibe.

Bi vî esasî divê dibistan, ji xweza û jiyana rastî dûr nekevin, amûrên ku di jiyana rojane de tîn bikaranîn divê di pêvajoya perwerdeyê de bînin bikaranîn. Taybetiyên pêvajoya perwerdeyê wiha ne:

➤ Xwewledîtina zarok di pêvajoya perwerdeyê de şertê herî sereke ye. Dibistan divê hem ji aliyê fîzîkî ve hem jî ji aliyê derûnî, hestiyarî û bîrdoziyê ve ewleyî bibe. Divê rengên dîwarên polan vekirî, hundirê polan bêhnfireh, erdê polan nerm bibin,

dolabên polan li gorî bejna zarokan û bi hêsanî vebin û bên girtin, pêlîstok û amûrên perwerdeyê ji bûjenên xwezayî çêbin, destşokên dibistanan li gorî bejna zarokan bin û paqij bin, Ji bo ku zarok hem bileyîze hem jî karên çandiniyî hîn bibe, divê bexçeyên dibistanan hebin. Hemû xebatkarên dibistanan(mamoste, paqijker, û hwd.) divê bi baldarî nêzî zarokan bibin, bi zimanekî zelal biaxivin, bi rûkenî û dilnizmî nêzî zarokan bibin, bi zarokan re têkiliyên hevbeş deynin.

➤ Di hundirê polan de cihên taybet (navendên hînbûyîne-goşe: muzîk, matematîk, fen û xweza, pêlîstok, şano, pirtûk, kolik û hwd.) bi beşdariya zarokan tîn amadekirin. Navendên hînbûyîne li gorî şert û merc û derfetên dibistanê û li gorî hewcedarî û taybetmendiyên zarokan, tîn amadekirin. Di amadekirina navendên hînbûyîne de beşdariya zarokan esas e, di heman demê de divê zarok bi hêsanî karibe navendan bi kar bîne. Li dîwarên polan panoyên pêşandanê divê li gorî bejna zarokan bin da ku zarok bi serê xwe çalakiyan bike û li van panoyan bi hêsanî daliqîne. Di polê de yekî zêdetir pano hebin dê baştir be, divê panoyek an jî du pano bi taybetî ji bo zarokan hebin.

➤ Hem di hundirê dibistanê hem jî li derveyê dibistanê de cihên ku di demên taybet de hemû zarok derkevin bileyzîn û bigerin, hebin. Di van cihên taybet de malbat jî dikarin tevlî zarokan bibin. Di vê encamê de pêşketina civakîbûyîna zarokan zêdetir dibe.

➤ Divê di navenda hînbûyîna muzîkê de, amûrên muzîkê yên rîtimî û yên ku bi hevkarîya zarokan hatine çêkirin, hebin, ya matematîkê teşeyên geometrîk, kartên hejmaran û hwd., yên fen û xwezayê, pel, kevir, kîso, ax, hûrbîn, dûrbîn, kokên çêreyan, dendik-qalikên fêkî û sebzeyan, amûrên xwezayî û hwd., ya şanoyê kostum, cil û berg, maskeyên ajal û mîrovan û hwd., ya pirtûkan çîrok, pirtûk, kartên hînbûyîne û hwd., ya kolîkê amûrên jiyana rojane(kevçî, qûşxane, îskan, tas, cil û berg û hwd) hebin.

➤ Li gel navendên hînbûyîne, cihên ku zarok karibin bi hêsanî tê de lîstikan bileyzîn, divê hebin.

➤ Dema xwarin û vexwarinê li gorî şert û derfetên dibistanan(hin zarok di hundirê polê de hin zarok jî li xwarinxaneyê) cih tên amadekirin. Dema rûniştinê, divê hemû zarok hevdû bibînin û bi awayekî komî rûnin. Di him amadekirina xwarin û vexwarinê de û him jî paqijiya derdoran de zarok jî cî bigire ji hêla hişmendiya parvekirin, piştgirî û berpirsiyariyê ve, dê baş bibe.

➤ Plansazî û pêvajoya perwerdeyê li gorî taybetmendiya zarokan teşe digire. Di amadekirina plansazî û çalakiyan de fikir û xwestekên zarokan li ber çavan tên girtin. Dibe ku hin çalakî her roj di heman demê de pêk bên, lê ku zarok ne amade bin an jî nexwazin, divê çalakî bi zorê neyên kirin. Di biryardayîna pêvajoya rojê û hilbijartina çalakiyan de rola zarok a herî sereke ye.

➤ Pêşxistina jiyana rîtmîk ji bo zarokan girîng e. Zarok bi muzîkên rîtmîk(ger teyp, dvd û ger bi gotin), reqs bike û bileyîze. Di çalakiyên din de bikaranîna muzîkên rîtmîk, pêkan e. Lidarxistina çalakiya bi navê rond(dramatîzekirina gotinên stran) ji hêla pêşxistina jiyana rîtmîk ve, girîng e. Bi rêya rondê zarok stendin û berdana hilmê rêkûpêktir dikin, tevgerên xwe yên bilez û hêdî kontrol dikin, bi rêya dramatîzekirinê ji hêla afirandinê ve pêş dikevin û hînî têgeh, rewş û bûyerên nû dibin.

➤ Di dibistanê de karê jiyana rojane(paqijî, çandinî, boyaxkirin, temîrkirin, xêzkirin, şuştin û amadekirina fêkî û sebzeyan, amadekirina xwarinê û hwd.) bi hev ve tê kirin. Mamoste dide destpêkirin zarok tevî dibe. Carinan jî zarok dide destpêkirin, mamoste, xebatkar û zarokên din tevî dibin.

➤ Di çalakiyên jêkirin, boyaxkirin û hunermendiyê de zêdetir zarok bide destpêkirin, dê baştir be. Ji bo ku zarok fikir û raman û hestên xwe bi xwe bîne ziman, kaxizên vala tên dayîn da ku zarok bi xwe xêz bike. Di çalakiyên her wekî din de amûrên nesazkirî di destên zarokan de hebin, zarok dê ji hêla afirandinê ve xwe pêş ve bibe û berhemên nû derxîne holê.

➤ Li gorî şert û derfetên dibistanê pol weke atolye tê bikaranîn, an jî atolyeyeke ku zarok tê de bi herî, gîl û boyaxê amûran çêke, bê vekirin. Zarok di van atolyeyan de amûrên jiyana rojane, peyker û hwd. çêdike. Bi boyaxa(avkî, daran û hwd.) wêneyan xêz dike. Bi rêça dest û piyên xwe wênayan çêdike.

➤ Şano yan jî dramatîzekirin di pêvajoya perwerdeyê de, girîng e. Rolgirtin ji hêla zarokan ve jiyandin e, zarok kîjan rolê hilgire, hestên xwe tevlî dike û wî/ê rolê dijî. Di vir de li dijî zarokan, mudaxale ne rast e. Divê zarok bi serê xwe çavdêriyan bike, bi afirînêriya xwe dramatîze bike û xwe bijî. Mamoste carinan dibe alîkar û rêber, lê xweserî ya zarokan e.

➤ Vegotina çîrokan girîng e. Divê mamoste beriya vegotinê, çîrokê ji ber bike û bi awayekî şanogerî çîrokê vebêje. Di vegotina çîrokê de zimanê mamoste divê

zelal be, mamoste dikare dengê xwe biguherîne û tevgerên guherbar bike. Zarok ku bixwaze, mamoste çîrokê yan jî bûyerên çîrokê dubare dike. Mamoste dikare heman çîrokê dû û sê hefteyan carekê vebêje, dramatîzekirina çîrokê pêkan e û herî dawî nirxandina çîrokê girîng e.

➤ Di polê de pêşandana xêzefilman(bî weşana televîzyonê) ne di cî de ye. Zarok dema ku xêzefilman temaşe dike, zêdetir bi televîzyon û dvd'yan ve girêdayî dimîne û hestên xwe nîşan nade û bi awayekî fikirî û neberbiçav dijî. Dewsa xêzefilman bi pêlîstokan(bûkik) mijar bî vegotin, dê baştir be, wî çaxî jî ber ku zarok hemû tiştî zindî dibîne, fikir, raman û hestên xwe dide nîşandan.

➤ Di pêvajoya perwerdeyê de çalakiyên hemû zarokan bi awayekî peryodîk (çavdêrî, qeydên dangan, kamera hwd.)tên qeydkirin. Piştê li van qeydan tî meyzekirin û pêşketinên zarokan tî kontrolkirin.

➤ Di pêvajoya perwerdeya pêşdibistanê de lîstik girîng e. Di dema lîstikê de xweseriya zarokan li ber çavan tî girtin, di lîstikan de weke dramatîzekirinê li zarokan mudaxele nayê kirin, rêzikên lîstikê bi zelalî tî vegotin û zarok li gorî xwesteka xwe dilîzin. Ji bo ku zarok lîstikê pêk bîne, amûr tî amadekirin û şert û merc li gorî mijara

lîstikê tên nirxandin. Li gorî mijara lîstikê pol ji hêla ewlehiyê ve tê amadekirin.

➤ Di perwerdeya pêşdibistanê de hîndekariya xwendin û nivîsandina tîpan ne di cî de ye. Ji hêla taybetmendiya pêşveçûyîna zarokan ve xwendin

û nivîsandin di dema pêşdibistanê de ne pêwîst e. Lê ji bo ku zarok ji dibistana seretayî re amade be, divê masûlkeyên zarok yê biçûk pêş bikevin. Ji bo ku ev pêk were, bikaranîna meqesê, boyaxkirin, bi qelemê xêzkirin û hwd. çalakî tên lidarxistin.

